# KONFEDERALÎZMA DEMOKRATÎK

Ez vê projeyê (Konfederalîzma Demokratîk) diyarî pîrozbahiyên 1'ê Gulanê her wiha ji ber meha Gûlanê ye diyarî Denîzan, Mahîran û Tevahî Şehîdên me dikim.
Abdullah Öcalan

Naverok

Ji Îdelojiyên Heram Ber bi Jiyaneke Mirovane ve
Navenda Dîrokê Ne Dewletiye, Konfederal e
Sîstema Demokratîk ku Esasê Civakê ye Rêya Tenê Ya Çareseriyê ye
Rastiya Dîrokî Ya Rojhilata Navîn
Komara Demokratîk, Hemwelatiya Azad
Prensîbên Konfederalîzma Demokratîk
Xisletên Konfederalîzma Demokratîk
Wê Konfederalîzma Demokratîk Nava Dunyayê de Bibe Vebûna Nû Ya Çep
Tê Xwastin ku Ciyewazî û Pêwendiya Di navbera Girêdana Gel a Platonîk û Hunera Polîtîkaya Demokratîk de Baş Were Dîtin.
Encam

## Destpêk

Pêwîste têgîna Konfederalîzma Demokratîk were nîqaşkirin. Ya ez qala wê dikim demokratîkkirina Komarê ye. Têgihiştina min ya ji sosyalîzmê re wiha ye; Sosyalîzma pêkhatî jî di navê de, ez têgihiştina sosyalîzmeke ku xwe dispêre dewletê rast nabînim. Têgihiştina min ya Konfederalîzma demokratîk jî ev e. Heta ku demokrasî neyê pêşxistin sosyalîzm jî nabe. Bi desthilatiya Sovyetan jî ev çareser nebû. Sovyet, mîna dewleta rahibên Sûmeran bûn. Çîn jî wisa. Ji ber vê yekê jî nekarîn xwe li hember DYE ser lingan bigirin. Rewşa Rojhilata Navîn a heyî, ne ji jor de DYE'yê, ne jî di jêr de gel qebul dike. Rêveber di vê navberê de tengav bûne. Ya wê xwe biguherînin, yan jî wê di bin zextên DYE'yê de biçewisin. Pêla neteweperestiyeke nû çawa bû sedem ku dema borî da wendakirin, wê îro jî bide wendakirin. Li vir Konfederalîzma Demokratîk mîna dermanek e.

Dibe ku DYE bi sorkirina neteweperestiyê re rê li ber wendakirina sedsaleke veke. Neteweperestî sedsalekî da wendakirin, ji bo ev sedsal jî ne de wendakirin tê xwastin ku konfederalîzma demokratîk ji binîve were birêxistin kirin. Ev xeta serekeye. Tê xwastin ku sosyalîzmeke xwe dispêre demokratbûnê hebe. Esasê vêya ew her şeş xalên ku min di bernameyê de dabû diyarkirine. YE niha demokratîk dibe, Tirkiye demokratîk dibe, tevgera Kurd demokratîk dibe. Divê ev sentezekî çêbikin. Bila şaş neyê fêhmkirin, ez nabêjim bila Tirkiye konfederalîzm be. Bila pêkhateya xwe ya unîter jî bi parêze, lê ez dibêjim bila li gel vêya komara demokratîkbe. Ez li dewsa dewleta Barzanî-Talabanî dibêjim Konfederalîzma Demokratîk ya Kurdistanê. Divê ev bi Komara Tirkiyê re dost be.

Konfederalîzma demokratîk ne neteweperestiya Kurd e. Ji netewparêziya dewletî dûr mayîn, girîngî dayîna netewyeta demokratîk û pêvajoya Yekîtiya Ewrûpa wek sentezekî were fêhmkirin. Li ser vê bingehê dixwazim gel seferberbe. Bi vî rengî emê netewperestiyê ji xeterbûnê derbixînin. Konfederalîzma Demokratîk diyarî tevahî gelên cîhanê û Rojhilata Navîn dikim.

Çareseriya heqîqî ya ji bo gelên Rojhilata Navîn û her wiha ji bo cîhanê jî konfederalîzma demokratîk e. Konfederalîzma demokratîk rêxistingeriya netewa demokratîk ya ne dewlet e. Konfederasyona demokratîk rêxistiniya hindikahiyaye; rêxistiniya çandî, dînî, heta ya cinsî û mîna vaye. Ez ji vêya re dibêjim netewa demokratîk û rêxistiniya çandî. Ji her gundek komînekî demokratîk dikare derbikeve. Yekbûna hemû rêxistinên çandî dibe konfederasyon. Divê wekî xet were nîşandan. Ez ji vêya re dibêjim konfederasyona demokratîk ya ne dewlet.

Mînakên vê yên dîrokî hene. Beriya niha demokrasiya Atîna hebû. Di Sûmeran d ejî rêxistiniyeke heman hebû. Konfederalîzma Ewrûpa çêdibe. Konfederalîzma Rojhilata Navîn jî dibe. Ji bo Kurdan jî li Rojhilata Navîn Konfederalîzma Kurd di cî de ye. Îsraîl û Flîstîn di navbera xwe de dikarin konfederalîzma demokratîk saz bikin. Ji bo 22 dewletên Ereban, di navbera xwede konfederalîzmeke demokratîk ya demokrasiyê li ber çavan bigire, dibe. Tirk di navbera xwede dikarin konfederalîzma demokratîk ya Tirk saz bikin. Hun nikarin tevahî Tirkan di bin yek aleke dewletê de bînin bahev. Ji ber ku tev dewletên netewîne. Lê di navbera xwede dikarin konfederalîzma demokratîk saz bikin.

Ev ji bo Kurdan jî baş û di cîde ye. Kurd dikarin dinavbera xwede, bêyku dest bidin sînoran, konfederalîzma demokratîk ya Kurd damezrînin. Hemû parçeyên Kurdistanê, bêyku dest bidin sînoran û sînoran ji xwere wek asteng bibînin, divê sînoran mîna pirekî bibînin û bivî awayî konfederalîzma xwe ya demokratîk pêşbixînin. Wê Kurd dinavbera xwede têkiliya siyasî, çandî û polîtîk pêk bîne. Ez na bêjim hilweşandina sînoran, dibêjim divê sînoran jixwere bikin pir. Ti zirer û ziyanekî vêya ji ti kesî/ê re nîne. Eger ev neyê kirin wê her devereke Kurdistanê bibe gola xwînê. Kurd tenê bi vî awayî dikarin ji pêvajoyeke bixwîn rizgar bibin.

Demokrasiya Kurd ya bêxwîn encax wiha pêşbikeve. Di rewşeke berovajî de wê pêvajoyeke bixwîn ya mîna Filîstîn-Îsraîl were jiyankirin. Ev çareserî, wê pevçûna ku di derdora netewe-dewleta Kurd de pêşbikeve asteng bike. Ji bo vê yekê hilbijêrka tenê ewe ku dewlet netewe ji demokrasiyê re vekirîbe. Wê dest tê wernedin netewbûna demokratîk ya Kurd û li hev bikin. Ev wê pir bide qezenckirin. Pêwîst e Tirkiye, Îran, Sûrî û heta dewletoka Kurd jî li pêşiya vêya nebin asteng.

JI ÎDEOLOJIYÊN HERAM BER BI JIYANEKE MIROVANE VE

Dewleta netewe ya di dused salên dawî de weke hebûneke herî xwedayî hat pîrozkirin, di serdema fînansê de derz lê ketiye, ji ber ku di binya xwe de rastiyên civakî yên bi darê zorê helandine û tepisandine, bi awayekî jê tolê hilînin ketine rojevê û ev pêvajoyên bi hev re têkildar in. Têgihiştina karê ya serdema fînansê veguherîna dewleta netewe ferz dike. Di sîstematîkbûna pêxîrtengiyê de ev veguherîn bi roleke girîng radibe. Neolîberalîzm dixwaze dewleta netewe ji nû ve ava bike lê çi dike nake bi ser nakeve. Di vî warî de mirov dikare ji ezmûn û tecrûbeyên Rojhilata Navîn gelekî hîn bibe.

Ev hêman careke din nîşan didin ku konfederalîzma demokratîk weke alternatîfeke bi hêz dikeve rojevê. Di ezmûna Rûsya Sovyetê de pêşî ya di rojevê de li pêş hat girtin, konfederalîzm li ser navê dewleta navendî ji holê hat rakirin ev jî yek ji sedemên bingehîn ên jihevdeketina sosyalîzma pêkhatî ye. Bi serneketin di demeke kin de dejenerebûna Tevgerên rizgariya neteweyî ji nêz ve bi pêkneanîna wan a siyaseta demokratîk û

kofederalîzma wê re girêdayî ye. Tevgerên şoreşger ên dused salên dawî dewleta netewe şoreşgertir hesibandin konfederalîzm jî weke şêweyekî siyasî yê paşvemayî dîtin li gorî vê jî bûn xwedî helwest ev bû bingehê serneketina wan.

Kes tevgerên xwe bi sîleha modernîteya kapîtalîst dewleta netewe ve girêdan, yeqîn dikirin ku wê di demeke kin de bi vê sîlehê veguherînên civakî yên mezin pêk bînin, lê dereng serwextbûn ku bi vê sîlehê li xwe dane. Nêzîkatiya wan a gerdûnparêz, li ser xeteke rast pêşketî der barê xwezaya civakî de zû dereng wan gihandiye têgihiştina sosyalîzma pêk bê. Eskatalojiya (baweriya bi axîretê) di Pirtûkên Pîroz de bi awayekî weke sosyalîzmê xwe daye der. Civak li ser xeteke rast weke modelên pêş dikevin bi navê destpêk, koledar, feodal, kapîtalîst sosyalîst teswîr kirine. Li vir bi awayekî din têgihiştina çarenûs û qederê heye. Ev têgihiştinên dogmatîk ên kûr em ji wan bi tesîrbûne di bingehê wan de çarenûsperestiya dînî baweriya axîretê heye.

Netewe-dewlet li ser esasê înkara demokrasiyê û ji vêya jî zêdetir ya komarê hebûna xwe diyar dike û pêk tê

Pêvajoya modernîteya kapîtalîst pêvajoya dewletê ya herî zêde navendî dibe. Di civakê de navendên hêzê yên eskerî û siyasî yên ji wan re otorîte tê gotin ji bo sûdwergirtina yekdestdariya herî bi hêz têne astengkirin, civak bi awayekî herî zêde ji aliyê eskerî û siyasî ve bêhêz û bêrêveberî tê hiştin ev rewş jî dihêle ku rêveberiyên monarşiyên modern di pey re dewleta netewe ya hatiye pêşdebirin, civakê herî zêde ji aliyê eskerî û siyasî ve bê hêz bê sîleh bikin. Nîzama jêre nîzama huquq huzura civakî tê gotin, ji bilî damezrandina serwertiya çîna bûrjûvayê bêtir tiştekî din nîne. Ji ber ku mêtinkarî zêde bi şêweyên wê yên dewleta netewe îcbarî kirine. Dewleta netewe ya em dikarin wê weke xwerêxistinkirina desthilatdariyê ya dewleteke herî mezin a navendî bi nav bikin, şêweyê bingehîn ê rêveberiya modernîteyê ye.

Di rewşa heyî de alternatîfa tenê konfederalîzma demokratîk e. Ev, modela rêxistiniya pramîtî ye. Li vir axaftin, nîqaş û biyar ya koman e. Ji herî jêr heta herî jor delege wê bi hilbijartin werin û di lûtke de koordînasyonê çêbikin. Wê delege mîna karmendên gel yên salekî bixebitin.

Prensîba diyarkirina çarenûsa xwe ya netewan ne tenê mafê avakirina dewlet e

Konfederalîzma demokratîk pir girîng e. Em vêya ne tenê ji bo Kurdan, ji bo Rojhilata Navîn û her wiha ji bo cîhanê jî pêşniyar dikin. Wê bandoreke pêşî lê veker di xetimandina ku jêdera xwe ji dewlet-neteweê digire de, bike. NY (BM) ya ku dispêre netewe-dewletê îflas kiriye. Pirsgirêka Iraqê vêya pir baş raxist berçavan. Neçareseriya ku di çarika dawî ya sedsala 20. de tê jiyankirin, rewşa Kendavê (Körfez), Iraq û Afganîstanê di holê de ye. NY bêçareye, DYE vêya hindek fêhmkiriye lê pêşkêşkirina modelekê ya emperyalîzmê sînordar e. Li dewsa alternatîfeke demokratîk ya heqîqî di welatên mîna Tirkiye, Misir û Afganîstanê de li pey modelên sixte yên demokrasiya rast berovajî dikin de ne.

Prensîba diyarkirina çarenûsa xwe ya netewa ne tenê mafê avakirina dewlet e. Lenîn mehfa vêya anî. Lenîn û Stalîn ji ber vê prensîbê pir zêde wek prensîba avakirina dewletê dest girtin û bi vî awayî felaketên dîrokî bixwere anîn. Ji bo rizgariyê komên dewletê yên sixte avakir. Ez diyarkirina çarenûsa xwe ya netewan wiha fêhm dikim, ji ber ku di Kurdan de qismeke pey vêya dikevin hene: ev maf, mafê avakirina demokrasiya xwe û çêkirina rêveberiyeke xwe ya ne dewletiye. Mafê avakirina modelekî ya komên ne dewletîne û hemû pirsgirêkên xwe di gundan de, taxan de û di çarçoveya bajaran de muneqeşe bikin, biryaran bigirin û çareserbikine.

Min ji bo gelê Kurd mînaka Enkîdoyê hevkar yê ev pênc hezar sale ji dema Gilgameş ve dabû. Dewleteke hevkar a erzan didin sazkirin. Ez êriş nakim ser damezrandina wê

dewletê. Lê wê ev dewlet li Rojhilata Navîn dawiya dawî karekterê dewleteke destpotîk bigire. Tê zanîn avakarên van dewletan kî ne. Wê ev dewlet xwîna gel bimije, ji ber ti pêwendiyeke xwe bi demokrasiyê re nîne. Niha jî xwe wek serokê dewletê îlan dikin. Lê dij derketina min a li dijî netewe-dewletê, wek derketina Zerduşt û Hz. Brahîm bimane û bibandor e. Biqasî dij derketina Hz. Brahîm li dijî Nemrût hêjaye. Ez ji bo pesnê xwe bidim vêya nabêjim, pêwîstiya min bi pesindanê jî nîne, lê dij derketina min bimaneye, yên dixwazin fêhm bikin dikarin fêhm bikin. Qey ezê serî ji Nemrûtan re bitewînim? Serê xwe ji axayan re danaynim. Îdeolojiya netewe-dewlet heram e, ez hezar carî nanê tifsî jî bixwim, lê minneta van dewletan nakim, her tiştê wan heram e.

Di demên krîzan de sîstemên modern dikarin bizên

Çawa ku di tevahiya dîroka şaristaniyan de hatiye ceribandin, di demên modern de jî hewldanên sîsteman ên yekdestdarîbûn û hev tinekirinê encam nedane, berdêlên wan jî giranbûne. Bêguman korbûnên di vî warî de bîlançoyên van şerên sîsteman gelekî giran kiriye. Sîstem wê giraniyê li ser hev çêkin bixwazin bi vî awayî jiyana xwe dewam bikin. Ji asta global heta bi asta xwecihî wê timî hegemondariyê bêne ferzkirin, berxwedanên dijber jî wê ji ceribandinan dersan bigirin û bi awayekî herî bi hêz dewam bikin. Heta çareserî nebe, em ê şer aştiyê her bi hev re bibînin. Analîz û çareserî hê bêtir serketî bibin, rastî, qencî û bedewiyê çiqasî nîşan bidin, bêguman rewşeke em karibin jêre bibêjin bêşerî û bêaştiyê pêk bê em ê karibin dinyayeke bi nirx bi arez bêtir xeyal bikin, pêk bînin. Bêguman hê zêdetir aştî hê kêmtir şer rewşeke bi nirx e, hewldanên ji bo pêkanîna wê jî hêjane esîl in. Bi şertê ku mirov bi prensîb, bi anor bi rûmet be.

Me hegemondariya kapîtal a fînans globalê bi xwe weke pêvajoya krîza herî kûr terîf kir. Bûyer vê terîfê piştrast dikin. Herweha me bi awayekî berfireh anî ziman ku krîz sîstemîk ji avabûnê ye. Nûçeyên rojane yên der barê krîzê de jî karekterê sîstemîk avabûnê piştrast dikin. Di demên krîzan de sîstemên modern dikarin bizên. Hinek wexta dizên bi felc tînin, yên bi awayekî têkûz dizên jî kêm nînin. Di utopya lîberal a kapîtalîzmê de paketên çareseriyê yên gelekî berfireh pevkirî hîç kêm nabin. Nasekinin planên rojane, hefteyî, mehane, salane, deh salane pêncî salane dikin. Ev karê wan in, wê her bikin.

Civak ji her demê zêdetir ji rastiya xwe ya exlaqî polîtîk hatiye mehrûmkirin.

Di van demên krîzan de şensê hêzên modernîteya demokratîk dikare zêdetir bibe. Dîrokeke mezin a berxwedanê ya pişta xwe danê, utopyayên azadî wekheviyê pêşiya wan rohnî dike. Herweha dersên mezin ên ji têkçûn û kêmasiyan derxistine hene. Dema ku mirov li hemûyan di zikhev de weke desteke wezîfeyên entelektuel, exlaqî polîtîk serwext bibe bixe nava çalakiyê, bêguman şensê wan ê serketinê zêde ye. Dîsa jî aliyên xweser ên demên krîzê yên avabûn sîstemîk hene divê bi baldarî mirov li ber çav bigire. Herçiqasî li ser şopa rabihuriyê bin jî zanist felsefeya exlaqî-polîtîk a divê pêk bînin û nûbûnan bigire nava xwe divê ev neyê paşguhkirin. Naxwe weke ku gelek caran di demên berê de hatiye dîtin wê rê li seresere nêzîkbûn û serkoriyê veke. Tew misêwa xwe neo'kirina lîberalîzmê tehlûkeyê mezintir dike. Divê neyê jibîrkirin ku herkes ji pêxîrtengiya di sala 1929'an de li nava dinyayê pêk hat, li hêviya şoreşê bû, lê pêla faşîzmê ya bilind bû hê dewam dike. Civak ji her demê zêdetir ji wesfê wê yê exlaqî polîtîk hatiye mehrûmkirin. Teknolojiya înformatîk, dinyayên gelekî mezin ên ferazî û derfetên berevajîkirina rastiyên dinyayê pêşkêşî destê hêzên hegemondar ên îdeolojîk ên global dike. Avahiyên xwe yên riziyayî bi hêsanî bi sîstemeke nû ambalajkirî mîna nû çêbûye pêşkêş dike di vê de ti xirabiyê jî nabîne. Girseya heyî ji zûve veguherandiye girseya kerî ya faşîzmê. Li şûna hêvî şikandinê, divê mirov qîma xwe bi anîna cem hev a rastiya analîtîk hiskirinê neyne, ji sedî sed em

heta jiyana exlaqî polîtîk nexin her kêlî mekanê xwe, bi hêsanî em dikarin bêne pûçkirin, ji lewra jî ez van diyar dikim.

Îslama siyasî îdeolojiyeke milliyetgiriyê ye, olîgarşiyên dewletên netewe yên dused salên dawiyê maske dike

Mirov 'Îslama nerm' ji rêrûesmekê wêdetir weke diyardeyeke modernîst a dused salên dawiyê di çarçoveya dewleta netewe de bigire dest, wê manedartir bibe. Mirov wê weke Îslama ji rêûresma dîn ne, weke milliyetgiriyê avabûna wê fêhm bike gelekî girîng e. Ji ber ku ji bo serwextbûnê ev nuqte kilît e. Prototîpiya milliyetgiriya herêmî ye, mohra oryantalîzmê li ser e. Vedîtineke oryantalîstan e, ti têkiliya xwe bi jiyana Îslamî re nîne. Bi belavbûna li herêmê ya hêzên hegemonîk ên Ewrûpayê, nexasim jî bi hegemonya Elmanyayê re ji nêz ve têkiliya xwe heye. Di dema dawî de li dijî Rûsya Sovyetê bi hegemonya DYE'yê ve girêdayî ye. Gelekî girîng e ku mirov fêhm bike, Îslama siyasî ya hatiye vedîtin têkiliya xwe bi çanda Îslama dîrokî re nîne, ev cureyê Îslamê milliyetgirî ye, armanca wê jî parçekirina çanda wê ye, bi vî awayî dixwaze herêmê ji hêz û taqetê bixe.

Îslama siyasî îdeolojiyeke milliyetgiriyê ye, olîgarşiyên dewletên netewe yên dused salên dawiyê maske dike. Komara Îslamî ya Îranê vê rastiyê bi awayekî balkêş nîşan dide. Îslama Şîa ji serî heta dawiyê milliyetgiriya Îranê ye; îdeolojiya hegemonîk a rêûresma împaratoriya Îranê ye. Lê weke çanda orjîn, weke dîrok Îslam hem cuda ye, hem jî girîng e. Mirov heta Îslamê bi vê rastiyê ji hev dernexe, mumkîn nîne çanda Rojhilata Navîn analîz bike , dabeş bike û bike mijara hin çareseriyan. Deryayeke mezin a çandê ye, weke wezîfe li benda çareserkirinê ye. Nexasim di serî de Hz. Muhammed, ji roja derketina holê heta roja me ya îro weke hêmaneke demokratîk Îslam weke hêmaneke desthilatdar Îslam, dîrokek e ku wan ji hev dike, li ser vî bingehî dîroka gelan, hebûnên xwecihî û herêmî ji nû ve li benda nivîsandinê ne. Dîroka civakî bi vê paradîgmayê were pêşdebirin ji bo rohnîkirina roja me ya îro, nirxa xwe zêde misoger e. Şîroveyên bi heman rengî ji bo Cihûtî, Xirîstiyantî Zerdeştiyê jî (sentezên mîna Manîheîzmê jî girîng in) bêne pêşdebirin, çanda Rojhilata Navîn wê bi awayekî nêzî rastiyê bê analîzkirin ev yek ê rê li dewlemendiya maneyê veke.

Ji bo analîzên çandê, orjînên Sumer û Misrê bi qasî ku kilîta mijarê bin, girîng in. Rastiyek e ku piştrast bûye, dînên yekxwedayî û Pirtûkên Pîroz çavkaniya xwe ev orjîn in. Çanda Serdema Neolîtîkê ji hemûyan re dayiktî kiriye, ji lewra heta bandorên dîrokî yên vê çandê neyên analîzkirin, ti çand têra xwe rohnî zelal nabe. Hegel analîza çanda dema xwe di wê demê de spart heta çanda Serdema Antîk a bi sînor dihat bibîranîn çanda Misrê. Wexta ku dîroka çandî were tomarkirin şîrovekirin a derkeve holê wê Ronesanseke çandî be. Di rastiya çanda Rojhilata Navîn de ev wezîfe hê bi awayekî serketî bi cih nehatiye anîn. Fikrên dîroka dîndar milliyetgir ji pêşkêşkirina dogmayan wêdetir, vegotinekê pêşkêş nakin.

Hunê Sê Tiştan nîqaş bikin; Civaka Demokratîk, Dewleta Demokratîk, Siyaseta Demokratîk

Fikrên min yên di derbarê Konfederalîzma Demokratîk de divê bi netewe-dewletê re wekhev neyê dest girtin. Berovajiyê vêya tam dijberê neteweperestiyê ye. Wê dewlet jî fêr bibe, nû nû hewl dide fêhm bike. Bêguman fêhm nakin, profesor û rewşenbîrên wan yên nîqaş bikin nînin. Herkes matmayî ma. Ez vêya tenê ji bo Kurdan jî nabêjim. Fêhm nekirine. Ev şeş salin bi israr dibêjim ku hunê sê tiştan nîqaş bikin: Civaka Demokratîk, dewleta demokratîk, Siyaseta Demokratîk. Çareserî di vê nîqaşyê de ye. Di destê DYE'yê de bombe û çek hene, ji ber vêya nakin, bi sernakevin. Tiştên ku ez dibêjim CIA digire, baş vedikole, lê li gorî berjewendiyên xwe vediguherîne û pêk tîne. Ev rewş dişibe têkiliyên

Lenîn-Wilson. Li hember mafê diyarkirina çarenûsa xwe ya gelan a Lenîn li Rûsiyayê pêşxistibû, Wilson jî li gorî prensîbên xwe dibersivîne. Têkiliya diyalektîk ya di navbera Lenîn-Wilson de di şibe têkiliya min û ya Emerîka yan jî Bush. DYE li dijî Lenîn serket. Ka em binêrin wê di diyalektîka me de çawa be?

Ev yek bitekoşîna gelan wê diyar bibe. Em li dijî demokrasiya emperyalîst demokrasiya gel pêş dixînin û esas digirin. Lê ronakbîr vêya fêhm nakin. Li roxmî ku ez ewqase di nava tecrîteke girandeme jî lê ez bi tena serê xwe di mijara sosyalîzmê de bêhêvî nebûm. Ez bibiryardariyekî mezin û moraleke bilind têkoşîna xwe dimeşînim. Di mijara rêz girtina ji civak û mirov re gaveke herî biçûk jî nayê avêtin. Dixwazin gelê me bi birçîbûneke bêeman terbiye bikin, lê yek jî ji cihê xwe nalive. Wek ronakbîrekî ez di kêleka vê jiyanê re jî derbas nabim. Hemû dunyayê jî bidine min li xwe danaynim.

Konfederalîzma demokratîk li gorî armancê formuleke herî di cî de ye. Peyveke herî di cî de li gorî armancê, ev bû. Min formulasyoneke ji vêya çêtir ne dît. Peyvek e Ehven-î şer e. Bookchin jî, Walerstein jî, qala gelek mijarên girîng dikin. Nivîskarên Împeretoriyê teoriya nirxê dinirxînin, dibêjin nirx nayê pîvan. Digihijin hindek encaman. Teoriya nirxê ya Marx şaş e. Di rastiyê de min Kapîtal jî baş hûr nekola, lê di encam de dibe hevgirtin û şerê parvekirinê ya dinavbera çîna karker û çîna bûrjuwa de. Roza Luxsemburg rexne li Marx digire, dibêje heta ku civaka Pre-kapitalîst (beriya-kapîtalîzmê) nebe, çîna karker nikare bijî. Ya Roza hîn rasttir e. Çîna karker û bûrjuwazî dibin yek û piştre keda civakê dixwin. Cewherê teoriya nirxê ev e. Şoreşgertiya çîna karker ya li ser vê esasê pûç û betal e. Çima nirx nayê pîvan? Ji ber vê yekê nayê pîvan: min diparêznameyên xwede vekiribû û mînaka dayîkê dabû. Zehmetiya dayîk dikşîne, keda xerç dike bi pere nayê pîvan. Emê karkeriya bêpere ya mîna ya dayîkê li ku bicîh bikin? Mezinkirina zarok, lê meyzandin, keda ku di nava malê de dide, nayê pîvan. Bi gelemperî mirov çawa mezin bû? Mirov berhema dîrokeke sed hezarsaliye. Ji civakên komînî yên seretayî heta tekoşîna çandan eger hemûyê tevlî bikin, çawa dibe ku wê tevahî mirovahî danehevên xwe yên dîrokî, danehevên xwe yên zanistî daxîne asta daxwaza bi pere ya bûrjûwaziya biçûk? Bi nedîtina van rastiyan re tu nikarî nirx bipîvî. Civaka neolîtîk, civaka koledar, civaka feodal, eger em hemûyê tevlî bikin dibe çîna karker. Kedeke Marx ji zanistên civakî re çêbûye lê, pir zêde kêmahiyên xwe heye, tişteke bimane ji civakê re neaniye. Di encam de bi teoriya nirxê re ucreta çîna karker zêde bû.

Wekî di dîroka mirovahiyê de dewlet ne ezeliye, dewlet-netewe jî ne bêdawiye

Presîba mafê diyarkirina çarenûsa xwe ya netewan ku di sedsala 20. hatiye pêşxistin, wek mafê avakirina dewletê hatiye fêhm kirin. Dewlet-neteweên ku li ser vê bingehê çêbûne di roja me de li ber pêşketinan dibin kelemên cidî. Modela NY ku xwe dispêre netewe-dewletê nameşe. Şerê Kendavê û rewşa Iraqê îsbata vê yekê ye.

Sîstematîka dewleta netewe ya roja me ya îro herçiqasî pirsgirêkên xwe yên giran hebin derzên lê ketine her roja diçe vedibin jî hê jî di qada neteweyî, herêmî global de xwedî sîstematîka herî bi hêz e. Dewletên netewe (hejmara wan ji dusedî derbas dike) bi yekîtiyên herêmî (di serî de YekîtiyaEwrûpayê, DYE-Kanada-Meksîka, Başûr-Rojhilatê Asya) Neteweyên Yekbûyî ya global tê temsîlkirin, li beramberî vê ji bo sîstema şaristaniya demokratîk yekîtiyên gel û kedkaran ên cûrbicûr ên nebûne desthilatdarî, dewlet mîna Forma Civakî a Dinyayê sist, bê form kêm in, têrê nakin. Kêmasî di bingehê avabûna îdeolojiyê de ye. Ji bo jiholêrakirina vê kêmasiyê divê Konfederalîzma Demokratîk a Dinyayê, konfederasyonên demokratîk ên neteweyî yên xwecihî, herêmî, divê weke amûrên van partî û civaka sivîl bêne pêşdebirin.

Rêya esasî ya derketina ji vê rewşê ne kûrewîbûna ku li gorî dewlet-neteweê pêş dikeveye, sîstema konfederalîzma demokratîk ya bi temamî xwe dispêre gel û hêza xwe ji jêr digiriye. Wekî di dîroka mirovahiyê de dewlet ne ezeliye, dewlet-netewe jî ne bêdawiye. Di roja me ya îro de bi kûrewîbûnê re dewlet-netewe tê derbas kirin. Lê ji ber emperyalîzm di vê pêvajoyê de modela sîstemeke nû ya cidî pêş nexistiye, krîza sîstema heyî kûrtir bûye û veguheriye kaosê.

Ji bo çareseriya pirsgirêkên civakî û dîrokî ya di Rojhilata Navîn de giranbûne jî sîstema konfederalîzma demokratîk baş e. Ferzkirinên sîstema kapîtalîst û hêzên emperyal nikare demokrasiyê pêş bixe, lê tenê dikare demokrasiyê xirap bikar bîne. Di sîstema konfederalîzma demokratîk de ew hilbijêrka demokratîk ya di jêr de pêşdikeve serdest kirin, esas e. Ev sîstem li ser esasê civakî sîstemeke ku rengîniya etnîkî, dînî û çînî li ber çavan digireye.

Ji bo Kurdistanê jî mafê diyarkirina çarenûsa xwe, ne li ser bingeheke neteweperest avakirina dewletê, bêyku sînorên siyasî ji xwere bike pirsgirêk û sînoran ji xwere esas bigire, tevgera avakirina demokrasiya xwe ye. Li Îranê, Tirkiyê, Sûrî û heta ew çêbûna Kurd ya li Iraqê çêbibe jî, hemû Kurd werin bahev federasyonên xwe, biyekbûnê re jî wê konfederalîzma jor çêbikin. Di Konfederalîzma Demokratîk ya Kurdistanê de hêza biryargirtinê ya esasî ya meclîsên gund, tax, bajaran û delegeyanin. Ji lewma jî biryara gel û ya herî jêr esas e.

Heta ku polîtîka nekeve dewrê krîza dewletê çareser nabe

Sîstema demokratîk weke modernîteya dijber divê her biçe xwe berbiçav bike û di van şert û mercan de hebûna xwe bi hêz bike. Wexta van bike, bi awayekî serketî divê pirsgirêkên şêweyê jî çareser bike. Me bi vê armancê hewl da diyar bikin ku konfederalîzm ji dîrokê re xerîb nîne û ji xwezaya civaka roja me ya îro ya her diçe tevlîhev dibe bersiva herî baş e. Me timtim anî ziman ku rêya xwe îfadekirina herî baş a civaka exlaqî û polîtîk siyaseta demokratîk e. Siyaseta demokratîk şêwazê avakirina konfederalîzma demokratîk e. Demokratîkbûna xwe jî ji vî şêwazî digire. Modernîteya dijber a her ku diçe navendî dibe bi amûrên desthilatdarî dewletê yên heta çaviyên hundir ê civakê belavbûna hewl dide hebûna xwe dewam bike, ya rastî qada polîtîk jî tine dike. Li miqabilê vê siyaseta demokratîk derfet û îmkan dide her beş û derdorê ku bibin hêza siyasî û nasnameya xwe îfade bikin û bi vî awayî bi xwe re civaka polîtîk jî pêk tîne. Polîtîka ji nû ve dikeve jiyana civakî. Heta polîtîka nekeve dewreyê krîza dewletê nayê çareserkirin. Krîz bi xwe ji ber înkara civaka polîtîk pêk tê. Ji bo krîzên dewletan ên roja me ya îro kûrbûyî li dawiyê bêne hiştin rêya bi tenê û yekane siyaseta demokratîk e. Naxwe gera li dewletên navendî yê zêdetir hişk wê nikaribin xwe ji şikestinên xirabtir xilas bikin.

Dewleta netewe çiqasî înkara demokrasiyê be, konfederalîzma demokratîk jî tersê wê ewqas şêweyê wê yê pêkhêner û fonksiyonelker e

Nikarîbûn analîz bikin ku xwezaya civakî bi awayekî bingehîn wesfê wê exlaqî û polîtîk e, lê sîstemên şaristaniyê van wesfên wê dirizînin, li şûna wan pîvanên huquqê yên çor îdareya dewletê datînin, modernîteya kapîtalîst vê pêvajoyê bê sînor, kûr berfireh pêşve dibe ev ji aliyê ekonomîk, civakî, desthilatdarî û dewletî ve krîz e. Ya rast, qenc bedew bi pêkanîneke tam a wesfên exlaqî û polîtîk ê civakê ji bo vê jî pêşbîniya sîstema konfederal a demokratîk a bi siyaseta demokratîk dimeşe nekirine. Ji vî alî ve analîz û çareserî nehatine kirin. Nikarîbe bibînin ku civaka azad, wekhev û demokratîk bi amûrên desthilatdarî û dewletê ve nayê pêkanîn, berevajî bi van amûran re nakok e; herweha nikarîbûn teorîze û pratîze bikin ku herdu bi tenê li ser bingehê hebûna hevdu qebûl bikin

û bi aştiyeke bi prensîb dikarin bi hev re bijîn. Dema ku weke paradîgma bingehîn şoreş-desthilatdarî-sosyalîzm hat qebûlkirin, divê mirov matmayî nemîne ku di encamê de ji kapîtalîzma dewletê wekî din tiştekî din pêk neyê.

Konfederalîzma demokratîk xwedî wê potansiyelê ye, ji neyêniyên çavkaniya xwe sîstematîka dewleta netewe ye bibihure û di polîtîkkirina civakê de amûra herî di cih de ye. Besît e, mirov dikare bi cih bîne. Her kom, etnîsîte, çand, cemaeta dînî, tevgera entelektuel, yekeya ekonomîk û hwd. dikarin xwe yekeya polîtîk bi awayekî xweser ava îfade bikin. Di vê çarçoveyê de divê mirov têgînên Federe yan jî xweserî xwebûnê bigire dest binirxîne. Her xwebûn şensê xwe heye ji xwecihî heta bi globalbûnê konfederasyonan pêk bîne. Hêmana herî bingehîn a xwecihê mafê biryar û guftgoya azad e. Her yekeya xwebûnê yan jî ya federeyê, bêhemta ye, ji ber ku demokrasiya beşdarî û tevlîbûnê ye weke demokrasiya rasterast bûye têgîn şensê xwe yê bi cihanînê heye. Hêza xwe hemûyî ji rasterast bi cihanîna demokrasiyê digire. Yek ji sedema hebûna rola wê ya bingehîn jî ev e. Dewleta netewe çiqasî înkara demokrasiyê be, konfederalîzma demokratîk jî tersê wê ewqas şêweyê wê yê pêkhêner û fonksiyonelker e.

DÎROK NE DEWLETDAR Û NAVENDÎ YE, KONFEDERAL E

Konfederalîzma demokratîk weke ku yeqîn tê kirin şêweyekî rêveberiyê yê xweserî roja me ya îro yê ji rêzê nîne. Sîstemek e ku di dîrokê de bi giranî cih dîtiye. Di vê çarçoveyê de dîrok ne dewletdar û navendî ye, konfederal e. Formê dewletê ji ber ku fermî bû dîrok dewletdar navendî ne, konfederal e. Dîrok wiha hatiye naskirin. Lê jiyana civakî zêdetir nêzî konfederalîzmê ye. Dewlet dema timî ber bi santlîzmê ve dibeze, berjewendiyên yekdestdariyên desthilatdariyê yên xwe dispêre wan esas digire. Naxwe nikare van berjewendiyan biparêze. Lê santralîzmeke hişk dikare van berjewendiyan misoger bike. Di konfederalîzmê de tersê vê ye. Ji ber ku ya esas digire yekdestdarî nîne civak e, bi qasî ku dikare divê xwe ji santralîzmê dûr bigire, bireve. Ji ber ku civak homojen (tek girse) nînin ji gelek kom, sazî cudahiyan pêk tê, divê wan hemûyan di nava ahgengeke hevpar de bike yekpare wan biparêze. Ji lewra ji bo pirraniyan rêveberiyeke zêde navendî rê li serhildanan vedike. Di dîrokê de bêhejmar mînakên vê hene. Konfederalîzma demokratîk ji ber ku her kom, sazî cudatî dikare xwe têde nîşan bide hê bêtir pêk tê. Weke sîstem gelekî nayê naskirin, ev ji ber îdeolojî û avahiya hegemonîk a şaristaniya fermî ye. Terîfa wê ya fermî nebe jî dîrok bi awayekî bingehîn konfederalîst e.

Girîng e ku mirov fêhm bike, împaratoriyên gelekî navendî têne zanîn jî bi awayekî konfederalîst in

Bi tevahî rêveberiyên eşîr, qebîle, qewman timî bi wesfê têkiliyên sist dest rê didin konfederalîzmê. Naxwe xweseriya wan a hundir zirarê dibîne. Ev jî hebûna wan belav dike. Heta împaratorî jî di avahiya xwe ya hundir de xwe dispêrin bêhejmar rêveberiyên cuda. Her cure rêveberiyên qebîle, eşîr û qewman, dînî, otorîteyî, qraltî, heta komar û demokrasî jî di binya împaratoriyê de dikarin bibin yek. Di vê çarçoveyê de gelekî girîng e ku mirov fêhm bike, împaratoriyên gelekî navendî têne zanîn jî bi awayekî konfederalîst in. Meyla navendî ya civakê ne, modeleke îdarî ye ku pêdiviya yekdestdariyê pê heye.

Di dîrokê de polîtîkayên xwecihî û herêmî her hebûn di dewamkirina hebûna civaka exlaqî polîtîk de bi roleke girîng rabûn. Di serî de deverên çol, daristan û çiya li cografyayeke berfireh a ser rûyê erdê netewe û gelên weke civakên qebîle, eşîr, gund û bajar dijîn bi polîtîkayên xweser û serbixwe timî li dijî hêzên şaristaniyê li ber xwe dane. Ji ber vê sedemê em dibêjin rêûresma konfederal a demokratîk di dîrokî de giraniya xwe heye. Em dibêjin di tevahiya dîroka şaristaniyê de meyla serdest sitû tewandin nîne, berxwedan e. Eger wisa nebûya dinyayê bûbûya Misra Firewnan. Eger em nizanibin ku ti

navçe û herêma mirov nemaye ku têde berxwedan û polîtîka çênebûye, em ê nikaribin dîrokê bi awayekî rast şîrove bikin. Eger gelên Emerîkaya Latîn, Efrîka Asya hîn jî bi hem rengên xwe û çandên xwe li ber xwe didin, ev tê wê maneyê ku dîroka wan jî wisa ye. Ji ber ku dîrok 'niha' ye.

Lêgerînên dilê sîstemê kun dikin

Herdu sîstemên modernîteyê weke me bi awayê berê prensîb û şertên wan pêşkêşkirin di nava demeke dirêj a bi şer û aştiyê de bivê nevê wê bi hev re bijîn. Ev, rastiyeke jiyanê ye. Ev pêvajoya bi dema dirêj ne bi nêzîkatiyên aştiyane yên teslîmkar û bê prensîb, ne jî di her şert û mercî de bi têgihiştin û pratîkên bi şer pevçûn dewamkirin rast e. Sîstematîka dewleta netewe û sîstematîka konfederalîzma demokratîk bi qasî bi aştiyên bi şert û prensîb tijî ne, di rewşên binpêkirina van şert û prensîban de jî felsefeya siyasetê û nêzîkatiyên stratejîk taktîk şerên xweparastinê li ber çavan digirin ev ji meşa azadî, wekhevî û demokratîk a civaka dîrokî re di cih de ye.

Mirov nikare înkar bike ku kapîtalîzmê weke sîstema daneheva sermaye û karê mohra xwe li modernîzmê xistiye û hê jî weke hêza hegemon a global serdestiya xwe ya fînansa kapîtal dewam dike. Tevî vê yekê, dîsa mirov nikare înkar bike ku û weke sîstem ji dema hatiye avakirin di tevahiya şertên zeman û mekan de hêzên gelekî bi hev re nakok di nava xwe de digire. Bi armanca têgîn hêsan bibe, ev hêz weke hêzên modernîteya demokratîk têne terîfkirin û bi tenê weke tevgerên rizgariya neteweyî û sosyalîzma pêkhatî ne, tê zanîn di serî de anarşîzm, di van demên dawiyê de li gavavêtinên mîna ekolojîk, femînîst sîstemên dîndar ên radîkal jî şahidî têne kirin. Sînga sîstemê ji zû ve hatiye qelaştin, yên ji hundir û derveyî wê hatine (Zêdetir divê ez bibêjim ên ji derveyî wê hatine. Ji ber ku xwezaya civakî bi awayekî esasî hêzên ji derve hatine nas dike), di tevahiya zeman û mekanên vê sîstemê de hebûna xwe, xwestekên xwe yên wekhevî û azadiyê timî anîne ziman û xistine nava çalakiyê. Dîsa ji lêgerîna xwe ya sîstemê ti carî paşve nemane.

Eger bereya şaristaniya demokratîk, destketiyên hînê dixwaze, yên hewce heq kirine nikare bi dest bixe, sedema vê ya bingehîn ew e ku şoreşa paradîgmaya pêdivî pê heye (nêzîkbûna zanistî ya bingehîn) hînê bi temamî nekiriye û nikarîbûye xwe bigihîne hêza têrê dike ya bername, rêxistin çalakiyê. Ev ne ew hedef in ku mirov nikaribe bi dest bixe nikaribe xwe bigihîne wan. Tevgera şaristaniya demokratîk dikare li nasnameya xwe ya rastî xwedî derkeve ango li azadî, wekhevî demokrasiyê, dikare analîzên xwe yên dîrokî-civakî bike. Bi vî awayî şêweyên xwe yên bername, rêxistin çalakiyê yên di asta dinya, herêm xwecihî de ava bike. Konfederalîzma Demokratîk a Dinyayê; ji bo Asya, Efrîka, Ewrûpa û Awûsturalyayê weke konfederalîzmên demokratîk ên herêmî dikarin di rojevê de cih bigirin. Nexasim ji bo Rojhilata Naverast, projeya Konfederalîzma Demokratîk a Rojhilata Naverast ji bo derketina ji rewşa kaotîk a heyî dikare bibe xebateke manedar.

Konfederalîzma demokratîk jî li dijî vê dîroka çarsed salên dawî, dîroka di xweparastin, pirretnîsîte, pirrçandî û pêkhatinên siyasî yên cuda de israr e

Modernîteya demokratîk çi weke bingehê dîrokî, çi jî ji aliyê xwezaya civakî ya tevlîhev a rojane ve, weke modeleke bingehîn a siyasî konfederalîzma demokratîk diyar dike û ev hilbijartinek kêfî nîne. Ev banê siyasî yê civaka exlaqî û polîtîk îfade dike. Mirov heta bi temamî serwext nebe ku xwezaya civakî homojen û monolîtîk nîne, serwextbûna li konfederalîzma demokratîk jî zehmet e. Dîroka çarsed salên dawî ya modernîteya fermî li ser navê homojenkirina civaka pirretnîsîte, pirrçandî, pêkhatinên siyasî yên cuda xweparastinê bi awayekî çalakiya qirkirin kokqelandinê ye (bi giştî çandî, car caran jî qirkirina fizîkî ye). Konfederalîzma demokratîk jî li dijî vê dîroka çarsed salên dawî, dîroka

di xweparastin, pirretnîsîte, pirrçandî û pêkhatinên siyasî yên cuda de israr e. Post modernîzm tê wê maneyê ku ev dîroka bi şer a modernîteyê bi şêweyên nû dewam dike.

Dewleta netewe ya modern bi rêbaza gerdûnparêz, rast, pêşdebir û vebirrî (têgihiştina rêbaza li alternatîf û îhtîmalan girtî) dixwaze mirovê homojen (tek tîp), civaka kerî û girseyê ava bike. Modernîteya demokratîk jî bi rêbazên pirralîparêz, îhtîmalnas, li alternatîfan vekirî û dike civaka demokratîk berbiçav bibe, dihêle were dîtin, bersivê bide. Bi avahiya xwe ya ekonomîk a teserufê dide destê koman, li pêkhateyên siyasî yên cuda re vekirî ye, pirrçandî ye, li yekdestdariyan girtî ye, bersiv dide pêdiviyên bingehîn ên civakî yên ekolojîk û femînîst û alternatîfa xwe pêşde dibe. Li dijî dewleta netewe ya modernîteya kapîtalîst, alternatîfê siyasî yê modernîteya demokratîk Konfederalîzma Demokratîk e.

SÎSTEMA DEMOKRATÎK KU CEWHERÊ CİVAKÊ YE RÊYA YEGANE YA ÇARESERİYÊ YE

Bi tevahî yekeyên civakî pevgirêdanê bi tayên sist bi tenê bi şertê ji xweseriya wan re rêz were nîşandan wê qebûl bikin. Ji hêzên dewletdar desthilatdariyê yên şaristaniyê re jî bi tenê bi vî şertî razî dibin. Şertên têde razîbûn nebe misêwa rewşa şer e. Dema riza hebe jî ya pêk tê aştî ye. Prensîba rêveberiya civakî ya karibe bersivê bide tevahiya avahiya dewleta netewe û diyardeya desthilatdariyê ya civaka serdema modern hem zevt kiriye, polîtîka û konfederalîzma demokratîk e. Polîtîka weke siyaseta demokratîk tê îcrakirin, yekeyên civakî hem jî weke hêzeke federe wê tevlî pêvajoya konfederal bibin. Ev sîstem dinyayeke nû ya polîtîk e. Şaristanî û modernîteyê timî bi fermanê îdare kirin, şaristaniya demokratîk û modernîte jî bi lihevkirin, guftugo û bi rastî polîtîkayê rêve dibe. Rastiyên dîrokê û roja me ya îro çiqasî bêne berevajîkirin û sergirtin, bûyerên civakî yên esasî bi pêşengiya hunera polîtîkayê pêk hatine. Kapîtalîzmê di şertên krîzê yên global de desthilatdariya xwe li ser bingehê ji nû ve avakirina dewleta netewe hewl bide biparêze, bi tevahî hêzên modernîteya demokratîk jî divê sîstema konfederal a demokratîk a armanca wê bergirî û pêşdebirina civaka exlaqî û polîtîk e, pêşde bibin û bi vî awayî bersivê bidin krîzê ku ev wezîfeya wan a bingehîn e.

Li ber rohniya van ravekirinan em dikarin prensîbên giştî yên der barê wezîfeyên polîtîk ên hêzên modernîteya demokratîk de bi kurtasî li dora xusûsên li jêr pêşkêş bikin:

Xwezaya civakî bi awayekî bingehîn hebûn û pêkhatineke exlaqî û polîtîk e. Civak heta hebûna xwe dewam bikin wê wesfên wan ên exlaqî û polîtîk jî dewam bikin. Civakên wesfên xwe yên exlaqî û polîtîk ji dest bidin mehkûmê belavbûn, rizîn tinebûnê ne.

Eger mirov civakan li ser xeteke rast weke civakên destpêk, koledar, feodal, kapîtalîst sosyalîst pêş dikevin tesewir bike, wê ev yekê ji serwextkirina mirov li heqîqetên wan zêdetir wê berevajî bike û ser wan bigire. Daxuyanî û ravekirinên bi vî rengî propaganda barkirî ne. Rengê exlaqî û polîtîk karekterê bingehîn ê civakan e, mirov li gorî pileya hebûna van civakan bi wesif bike herî rast e. Çi wesfên çîn û dewletê, çi jî astên pêşketinê yên îndustriyel û cotkariyê diyardeyên demî ne ku di wê astê de nînin karketerê civakê diyar bikin.

Pirsgirêka civakî bi mêtinkarî tehekuma desthilatdariyê girêdayî derdikeve holê. Desthilatdarî û mêtinkarî çiqasî pêş bikevin pirsgirêkên civakî jî ewqasî pêş dikevin. Dewletên bingeha xwe çînî ne, weke amûrê çareseriyê têne ferzkirin, tevî kapasîteya xwe ya çareseriyê ya bi sînor bi awayekî bingehîn vediguherin çavkaniyeke nû ya pirsgirêkan.

Polîtîka bi tenê di çareserkirina pirsgirêkên civakî de ne, di diyarkirina tevahiya berjewendiyên heyatî de, di bergirî dewamkirina wan de amûrê bingehîn ê çareseriya civakî ye. Ji bo bergiriya civakê pêdivî bi xweparastinê heye û weke hêza eskerî dewama polîtîkayê ye.

Şaristaniyan tevahiya dîrokê her ku hewldan civakê bi îdareya dewletê rêve bibin, fonksiyona polîtîkayê di nava civakê de teng bû. Civak heta hebûna wan dewam bikin li dijî vê dortengkirinê bi berxwedanê bersiv didin. Dîrok di bin van du hêmanên sereke de ne tam îdareya şaristaniyê ye, ne jî tam rêveberiya polîtîka demokratîk e. Şerên di dîrokê de ji karekterê nakok ê van herdu hêmanên bingehîn pêk tê.

Di dîrokê de demên aştiyê hêzên şaristaniyê hêzên demokratîk hevdu nas bikin, ji nasname û berjewendiyên hev re rêz bigirin pêk tên. Şer agirbestên di rêya desthilatdariyê de têkiliya xwe bi aştiyê re nînin.

Desthilatdarî di dema modernîteya kapîtalîst de tevahiya civakê ji hundir û derve dor lê digire û bi awayekî vediguhere mêtingeriya hundir. Desthilatdarî dewleta netewe weke forma bingehîn a dewletê timî bi civakê re di nava rewşeke şer de ye. Polîtîka berxwedanê çavkaniya xwe ji vê rastiyê digire.

Ev rewşa şerê topyekûn a modernîteya kapîtalîst li dijî civakê, alternatîfa modernîteya demokratîk zêdetir lezgîn û mecbûrî dike. Modernîteya demokratîk weke hebûna hêzên şaristaniya demokratîk di roja me ya îro de, ne bîranîneke serdema zêrîn a rabihuriyê ye, ne jî utopyayeke der barê paşerojê de ye. Helwest û hebûna tevahî ferd û yekeyên civaka berjewendî û hebûnên wan bi sîstema kapîtalîst re nakok in.

Têkoşîna dused salên dawî ya hêzên dijberê sîstemê yan ji ber perspektîfa desthilatdariyê ya hildigirtin an jî bi sedema qada polîtîk vala hiştin bi serneketin, bê çareserî man. Tevî ku mîrateyeke bi nirx hiştine jî bi avahî û zêhniyetên berê, ne dikarin li dijî modernîteyê bi xwe, ne jî li dijî krîza sîstemîk dikarin alternatîfekê pêk bînin.

Ji bo alternatîfbûnê, bi pêşdebirina sîstema xwe li dijî sêlingên modernîteyê kapîtalîzm, îndustriyalîzm û dewleta netewe mumkîn e. Mirov dikare civakparêziya demokratîk, eko-îndustrî û konfederalîzma demokratîk bi navê modernîteya demokratîk weke sîstema dijber pêşniyar bike. Dijberên sîstemê li ser mîrateya şaristaniya demokratîk bigihîjin hev wê şensê serketinê zêde bibe.

Konfederalîzma demokratîk şêweyê bingehîn ê polîtîka modernîteya demokratîk e, di xebatên ji nû ve avakirinê de roleke heyatî îfade dike. Dewleta netewe forma dewletê ya bingehîn e, ji amûrê çareseriyê yê modernîteya kapîtalîst wêdetir timî rê li pirsgirêkan vedike. Konfederalîzma demokratîk a şêweyê bingehîn ê polîtîka modernîteya demokratîk e, li dijî dewleta netewe alternatîf e, ji bo rê vekirina li çareseriyê amûrê herî di cih de yê siyaseta demokratîk e.

Di civakên exlaqî û polîtîk de ku siyaseta demokratîk li ser kar e, azadî li ser bingehê cudatiyan bûyerên wekhevî û demokratîk bi rêya herî têkûz têne pêkanîn. Azadî, wekhevî û demokrasî bi tenê bi hêza guftgo, biryar û çalakiya civak bi hêza xwe ya zêhnî û wijdanê xwe bike dikarin pêk bên. Bi ti hêza muhendisiya civakî mumkîn nîne mirov vê bike.

Modernîte bi destê dewleta netewe modela civaka tek reng a faşîst, homojen û monolîtîk dimeşîne. Ji ber vê pirsgirêkên etnîk, dînî, bajarî, xwecihî, herêmî û neteweyî rû didin. Konfederalîzma demokratîk weke amûrê bingehîn ê çareseriya van pirsgirêkan alternatîfa neteweyê demokratîk pêşkêş dike. Di neteweya demokratîk de mafê her etnîsîte û têgihiştina dînî, rastiyên bajar, xwecihî, herêmî neteweyî ye ku bi nasnameya xwe avahiyê xwe yên federeya demokratîk cih bigirin.

Li beramberî Neteweyên Yekbûyî alternatîfa yekîtiya global a neteweyên demokratîk, Konfederasyona Neteweyên Demokratîk a Dinyayê ye. Qadên mezin ên çandî û parçeyên parzemînî dikarin di astên jêr de Konfederasyonên Neteweyên Demokratîk pêk bînin. Eger Yekîtiya Ewrûpayê di vî warî de hegemonîk tevnegere mirov dikare wê weke gava

pêşî bihesibîne. Gavavêtinên li dijî desthilatdariya hegemonîk a global û herêmî di vê çarçoveyê de mirov digire dest.

Hêzên şaristaniyê û hêzên demokratîk çawa ku di dîrokê de gelek caran kirine, hêzên modernîteya kapîtalîst û hêzên modernîteya demokratîk jî dikarin hebûna hev, nasnameyên hev qebûl bikin û rêveberiyên hev nas bikin û li ser vî bingehî bi hev re di nava aştiyê de bijîn. Di vê çarçoveyê de,  di bin van şertan de, di nava hundir û derveyî sînorên dewleta netewe de pêkhatinên siyasî yên konfederal demokratîk bi pêkhatinên dewleta netewe re bi hev re di nava aştiyê de dikarin bijîn.

Prensîbên der barê wezîfeyên qada polîtîk a modernîteya demokratîk de hatine tespîtkirin mirov dikare kêm jî dikare zêde jî bike. Ya girîng diyarkirina esasên naverok û pêkanînê ne. Ez yeqîn dikim ku bi vî awayî rêzkirineke prensîban bersiva armancê dide. Guftgo û rastiyên azadiyê yên jiyanê encamê diyar bikin.

Çînên navîn ne demokrasî, mîna kewareke faşîzmê ne ku lê alavên xwe dide ser hev

Ferdê/a dewleta netewe afirandiye koleye, ji wan ferdên ku dînên yek xwedayî afirandine zêdetir xetertir e. Ji aliyê dewletê ve afirandina ferd û hemwelatî dibe sedema hemû xetimandinan. Netewa demokratîk,  modeleke kom û ferd li ser esasê rastiya xwe ya herêmî pirsgirêkên xwe nîqaş dikin û çareserî di afirînine. Rast nîne ku hinek derbikevin binavê gel biaxivin. Ev ji bo min jî derbas dibe. Ev şêwaz ne rast e. Ya girîng ewe ku gel bixwe bibe hêza çareseriyê. Dewlet netew tam di rewşeke astengde ye. Hedefa me ne dewlet e, avakirina demokrasiyê ye. Ez behsa demokrasiyeke Ewrûpî ya xwe dispêre çîna navîn nakim. Dewleta netewe esas xwe disipêre çîna navîn. Ya navîn dixe hîmê çînayetiya xwe. Herçiqas bi awayekî din ji aliyê teorîk ve pêşketina wê mumkin be jî di pratîkê de pêk nayê. Dewleta netewe xwedayê modern ê çîna navîn e. Di xwestek  û zêhniyeta xwe de timî xeyal dike ku wê rojekê bigihîje vî xwedayî  bijî. Bêguman wexta vê dike wezîfe berjewendiyên xwe jî tedarik dike. Çawa ku di serdema berê de civakê bi rû yê rastî yê xwedayan nizanîbû  ji wan re îbadet dikir, çîna navîn a modern a roja me ya îro jî ya rastî xwedayê xwe ango modernîteya kapîtalîst nas nake. Lê hay jê heye ku ji bilî wî ti rêyek din li pêşiyê tineye. Di nava burokrasiya wê de yan jî di nava yekdestdarên wê de wezîfegirtin (di çarçoveya pîşeyan de) tê maneya rizgarbûnê. Civakê bi tevahî ji xwe dihesibîne. Çîneke gelekî egoîst e. Lîberal jî çîna navîn weke yek ji şertê bingehîn ê demokrasiyê dihesibînin. Lê belê berevajiya wê rast e. Çînên navîn ne demokrasî, mîna kewareke faşîzmê ne ku lê alavên xwe dide ser hev. Çawa ku têkiliya faşîzm  dewleta netewe ji rengê avabûnê ye, têkiliya faşîzm  çîna navîn jî ji rengê avabûnê ango strukturel e. Şêweyê avabûnê yê têkiliya faşîzmê bi yekdestdariya kapîtalîzmê re vî hukmê der barê çîna navîn de naguherîne.

Wexta ku demokrasiya lîberal a esas xwe disipêre çîna navîn, di lîstika herî mezin a demokrasiyê de li hemberî hêzên demokratîk bi ser dikeve  armanca wê ew e ku demokrasiyê pûç  nava wê vala bike. Bûrjûwaziya lîberal, demokratên lîberal di rewşa pêşketinên bi hêz ên demokratîk de dikarin weke baskekî çepgir bi awayekî erênî rabin. Ya divê haya mirov jê hebe jirêderketina çîna navîn e. Li dijî têkoşîna civakê ya demokratîkbûyînê, kapîtalîzm di warê bikaranîna çîna navîn de têra xwe bûye xwedî tecrûbe  ezmûn. Tawîzan dide, xeyalan hişyar dike û bi vî awayî timî zemînê jêr ê civakê ditirsîne û bi vî awayî polîtîka hundir dimeşîne. Di vê çarçoveyê de dewleta netewe şerê dijwar ê çîna navîn e. Dîsa di çarçoveya heman maneyê de dewleta netewe îlahê şer ê çîna navîn e. Wer fêhm dike, wer xeyal dike, wer jêre îbadet dike.

Li hemberî vî xwedayî şerê wî yê zêde kiriye, hêzên demokratîk jî neçar in çalakî û zêhniyeta xwe biafirînin, wekî din jî ti rêya wan nîne. Li hemberî vî xwedayî rêya bi tenê ya mirov karibe pêde biçe ew e ku divê jiyana azad xwe bike rê û alternatîfa bi tenê ya pîroz!

Afirandina demokrasiya ne dewletî, sînorên coxrafî esas nagire

Ji vê xwezaya wê ya çînî, têkiliyên desthilatdarî û dewletê bandoreke kansêrolojîk di nava civakê de dikin. Xwezaya çîna navîn bi faşîzmê barkirî ye. Avakirina demokrasiyeke ne dewlet, sînorên coxrafî esas nagire. Wexta dibe demokrasiyeke ne dewlet, pêwîst nîne ku sînorên coxrafî û dewletên dîtir hilweşîne. Emê sîstema xwe avabikin. Dewlet bivê nevê, gelê me li kube, komên gel li ku hebin, emê modela xwe ya çareseriyê li wir esas bigirin.

Partîbûneke di li ser esasê dewletê ji bo min wextê xwe derbas bûye, ev cûre partîbûn ayîdê sedsala 19.'ne, Partiya Bolşevîk jî daxilê vêya ye. Ev derbas bûye, pêwîst e vêya di xwede jî derbas bikin. Partî rêxistinên îdeolojîk û zihniyetêne. . Nabêje em bibin dewlet û hwd; raman û zihniyeta demokrasiyê rêxistin dike, pirsgirêkan derbas dike, kadroyên bijare çêdike, xebatên akademîk dike.

'Îdeolojiyên Dewletî' ji bo min êdî biqasî hatibûn tehlîl kirin, ji lewma jî ji bo min nedibûn amûrekî rizgariyê jî. Dewletên kapîtalîst, sosyalîst, ûnîter, netewî û çînên demokratîk yên federalîst em bihêlin pirsgirêkên ku civaka hiyerarşîk afirandiye dîn, cins, etnîsîte, hawirdor û çînî çareser bike, ev bixwe jêdera afirandina van pirgirêkanin. Di her aliyekî de çareseriyê li derveyî vê jêderkê gerîn û em ji gelên ku hê jî di civaka neolîtîk de mayîn û rewşa ferd ya di dirêjahiya dîrokê de di nava malbatê de tengav bûyî bigirin heta rastiya eşîretê ya di serê çiyayan û sehrayan de li ber xwe didin, em ji cemaetên dînî bigirin heta rastiya berxwedana objeftîf ya jinê ku ketiye hezar û yek rengan, em ji parastina saziyên bingehîn yên civakê bigirin, heta gihiştina azadiya ferd ya wenda, û spartina lêgerîneke pir alî ya 'Rê ya Nû' pêwîst e. Ev jî xwedî girîngiyeke bingehîn e. Ji şaristanî û civaka çînî ku hevsenga hawirdor û ekolojiyê serûbin kiriye, li ser esasê hevkariyeke şidayî bizanistê re bi lêgerîna civaka ekolojîk li çareseriyê gerîn weke wezîfeyeke êdî nayê taloqkirine.

Di cihên ku çalakiyên gel nîne de demokrasî **ş**în nabin

Demokrasî rejîmên bi çalakiyên gel ve pêwendîdar in. Di cihên ku çalakiyên gel nîne de demokrasî şîn nabin. Biqasî rêzgirtina dewletê ji çalakiyên gel re, pêwîste rêzgirtina gel jî ji dewletê re hebe û sîstema wê ya li hember xwe hişyare, xirap neke. Di li hevkirineke du alî de gihiştina hev esas e. Çawa ku eger her tişt ji dewletê re were hiştin dûrketin ji demokrasiyê be, di heman demî de her tişt ji çalakiyên gel re hiştin jî dibe anarşiyê. Neketina wan helwestên ku her timî di dîrokê de hatiye ceribandin girîng e. Di vê sedsala dawî de bitaybet serhildan û şerên ku çi binavê 'rizgariyên netewî' dibe çi jî binavê 'rizgariya sosyalîst' dibe tên kirin wek çalakiyên gel pîroz dîtin, ne rasteqîne.

Di tehlîla dawî de, rastiya derbaskirina 'dewlet-netewe' û 'sosyalîzma pêkhatî' derdixe holê ku ev îdîayane zêde zanistî nîne. Ji ev têgînên wisa giştî û yên wek wan re hîn bitedbîr û rasteqîn nêzîkbûn girîng e. Ev têgînane dişibin cureyekê dîn û xanedanan. Êdî çalakiyên gel biqasî li ser derveyî parastina rewa şîdetê nehewîne nava xwe, divê ne be armanca hilweşandina dewletê û avakirina dewletê. Di rewşeke berovajî de di ser re 70 sal jî derbas bibe û li ser 1/3'yê dunyayê bibe hakîm be jî ji derbasbûyînê rizgar nabe. Di rastiyê de mirov dikare armanca çalakiyên gel wiha formîle bike; dewlet saziyên demokratîk yên gel û bivî rengî bi azadbûna gel razî bibe û ji bo vê yeke jî, nûnerên gel yên berpirsyar qebûl bike. Ne ji bo dewletê secdekirin ne jî ji bo hilweşandinê şer û

çalakiyên binavê gel têne kirin mirov nikare rast û rewa binirxîne; eger nirxandin jî, wê di encam de nikarin xwe ji berovajî ketina azadiya gel rizgar bikin.

Çawa ku mirov dikare moderniteya kapîtalîst di çarçoveya sê hêman û şaxan de bifikire, nêzîkatiyeke bi heman rengî ji bo moderniteya demokratîk jî di cih de ye. Ji bo moderniteya kapîtalîst xisletên xweser û nedomdar ên bingehîn weke civaka hilberînê ya kapîtalîst, civaka îndustrî civaka dewleta netewe tê fikirîn di berdêla van de ji bo moderniteya demokratîk jî şax hêmanên civaka exlaqî û polîtîk, civaka eko-îndustriyel, civaka konfederalîst a demokratîk derdikevin pêş. Ji bo herdu sîsteman jî di detayan de mirov dikare gelek şaxan ji wan bibe û hêmanan destnîşan bike. Lê ji bo bi xetên sereke bêne terîfkirin ev hersê şax dikarin maneyeke têrtijî bidin.

Sêyemîn şaxê xwezaya civakî di asta rêveberiyê de mirov dikare bi şêweyê sîstema konfederalîst a demokratîk diyar bike. Tevî hem fikaran, mirov dikare ji sê şax û hêmanan hîn bibe. Ya girîng di zikhev de bûna şax hêmanan e. Bi awayekî kêfî belkî dibe ku li şûna yekê tiştekî din were bi cihkirin, lê tişta derkeve holê wê sîstema moderniteya demokratîk nebe, tiştekî din be. Sêberiya moderniteya kapîtalîst jî di zikhev de ye. Şax hêmanên wê pêdiviya wan bi hev ve heye, ango yek a din dixwaze.

Forma dewletê ya bingehîn a moderniteya fermî dewleta netewe ye, di moderniteya demokratîk de li beramberî vê û di berdêla wê de sîstema konfederalîst a demokratîk tê. Mirov dikare vê weke şêweyê rêveberiya siyasî ya ne dewlet terîf bike. Ya xweseriyê dide sîstemê jî ev xisleta wê ye. Rêveberiyên demokratîk divê mirov ji sedî sed bi rêveberiyên îdarî yên dewletê re tevlîhev neke. Dewlet îdare dikin, demokrasî rêve dibin. Dewlet xwe dispêre desthilatdariyê, demokrasî xwe dispêrin rizaya kolektîv. Dewlet wezîfedar tayîn dikin, di demokrasiyan de hilbijartin esas e. Di dewletan de îcbariyet, di demokrasiyan de bi dilê xwe esas e. Cudatiyên bi heman rengî mirov dikare zêde bike.

Modela konfederalîzma demokratîk azad dike, pirr demokratîk dike.

Yekeyên federe yên weke şaneyên sereke yên tevlîbûna rastrast ên demokrasiyê ne, wexta şert û merc hewce bikin xwedî wê nermbûnê ne ku veguherin yekîneyên konfedere, ji vî alî ve bêhempa û îdeal in. Bi şertê ku xwe bispêrin tevlîbûna rasterast a demokratîk her cure yekîtiya siyasî yekeyeke demokratîk e. Li deverên herî xwecihî demokrasiya rasterast a bê pêkanîn û di yekeyan de were meşandin, heta bi pêkhatinên global ve were pêşdebirin, mirov ji vê fonksiyoneliya polîtîk re dikare bibêje siyaseta demokratîk. Sîstema rastî ya demokratîk formulasyona pêkhatina van pêvajoyan hemûyan e.

Eger mirov bi baldarî çavdêriya xwezaya civakî bike, mirov ê bi hêsanî wesfê dewleta netewe yê ji 'qefesa hesinî' wesfê konfederalîzma demokratîk ê azad dike bibîne. Dewleta netewe çiqasî civaka ditepisîne, dike tek tîp û ji demokrasiyê dûr dixe, modela konfederalîzma demokratîk jî ewqasî azad dike, pirr û demokratîk dike.

Mirov dikare xweparastinê welê terîf bike; hûr û kûr meşandina siyaseta demokratîk îfade dike.

Xusseke din a divê mirov bala xwe bidiyê ew e, yekeyên federe û xwebûnê di çarçoveyeke gelekî dewlemend de hatine fikirîn. Gelekî girîng e ku mirov fêhm bike wê li gundekî yan jî kolana bajarekî hewcedariyê bi yekîtiyên konfedere hebe. Her gund an jî kolan bi hêsanî dikarin yekîtiyeke konfedere pêk bînin. Eger em mînak bidin, li aliyekî yekeya ekolojîk a gund ango federeya wê, li aliyê din jî ji yekeya jina azad heta bi xweparastinê, ciwan, perwerde, folklor, tenduristî, zibare ekonomiyê gelek yeke divê li nava gund rasterast tevlî demokrasiya gund bibin bi yek bin. Ji vê yekeya yekeyan re jî bi hêsanî mirov dikare yekeya konfedere (yekeya yekeyên federe) yan jî yekîtî bibêje. Dema

ku em heman sîstemê ji xwecihî heta bi herêmî, neteweyî asta di global de bibin, wê wextê bi hêsanî were fêhmkirin ku konfederalîzma demokratîk sîstemeke çiqasî berfireh e. Bi sîstematîka konfederalîzmê mirov baştir dikare fêhm bike ku sê hêmanên bingehîn ên modernîteya demokratîk hevdu temam dikin. Ji ber ku her hêman û şax xwedî wê potansiyelê ye ku dikare xwe di nava sîstemê de guftgo bike, binirxîne, bigihîje biryarê, ji nû ve ava bike bixe çalakiyê, rastiya civakê ya dîrokî ya xwezaya civakî yekparebûna wê jî bi awayekî herî baş tê pêkanîn.

Di sîstema konfederal a demokratîk de mirov xweparastina civakî jî bi awayekî herî baş dikare bi cih bîne. Xweparastin weke saziyeke siyaseta demokratîk di çarçoveya sîstema konfederal de ye. Mirov dikare xweparastinê welê terîf bike; hûr û kûr meşandina siyaseta demokratîk îfade dike.

Dewleta netewe bi awayekî bingehîn sîstemeke eskerî ye. Bi tevahî dewletên netewe berhemên şerên li hundir derve bi awayên cûrbicûr, demdirêj, bêrehm û bi şêweyên cuda hatine meşandin in. Mirov dewleteke netewe bi tenê ya ne berhemê şeran nikare bifikire. Bi tenê di qonaxa damezrandinê de ne, heta ji wê gelekî zêdetir di demên bi sazîbûn û ji hevderketinê de dewleta netewe ji hundir û derve xwe bi zirxekî mîlîtarîst (eskerî) li tevahiya civakê badide. Civak bi tevahî dibe eskerî. Desthilatdarî saziyên dewletê yên ji wan re îdareya sivîl tê gotin, ya rastî weke perdeyekê ser vî zirxê eskerî digirin. Amûrên ji wan re demokrasiya bûrjûvayê tê gotin jî hê zêde diçin bi cîlaya demokrasiyê û vê avahî zêhniyeta mîlîtarîst dinixumînin propaganda dikin ku sîstemeke civakî ya demokrat lîberal li ser kar e. Mirov heta vê nakokiya fena ya rêveberiya modernîteyê ji hev dernexe, mirov nikare behsa çi siyasîbûneke rast meşandina siyaseta demokratîk bike. Diyardeya jêre esker-millet tê gotin ev e. Ev diyardeyek e ku ji bo tevahiya dewletên netewe yên çarsed sal avabûne bi vî rengî ye. Di binê tevahiya pirsgirêkên civakî, pêxîrtengî û rizînan de ev rastî heye. Li ser navê çareseriyê ya tê ferzkirin û misêwa tê dubarekirin anîna desthilatdariyên faşîst e (bi darbe, bêdar be, faşîzmên esker, sivîl), ev jî pêdiviyeke xwezaya dewleta netewe ye; ev rewşa wê ya herî xweser e ku şêweyê wê îfade dike.

Konfederalîzma demokratîk vê mîlîtarîstiya çavkaniya xwe dewleta netewe ye, bi tenê dikare bi amûrê xweparastinê rawestîne. Civakên ji xweparastinê mehrûm in, nasnameyên xwe, xisletên xwe yên polîtîk û demokratîkbûna xwe ji dest didin. Ji lewra hêman û şaxê xweparastinê ji bo civakan diyardeyeke besît û a parastina eskerî nîne. Bi parastina nasnameyê re, bi pêkanîna polîtîkbûna wê û bi cihanîna demokratîkbûna wê re di zikhev de ne. Eger civak karibe xwe biparêze, mirov dikare behsa parastina wê ya nasnameyê, pêkanîna polîtîkbûna wê û meşandina wê ya siyaseta demokratîk bike. Li bin rohniya van rastiyan konfederalîzma demokratîk di heman demê de divê weke sîstemeke xweparastinê şax berde. Di serdema hegemonîk a yekdestdariyên global de û di van şert mercan de ku bi şêweyê dewleta netewe tevahiya civakê milîtarîst kiriye, modernîteya demokratîk jî divê di heman çarçoveyê de di şert û mercên hem zeman mekanan de li ser bingehê xweparastin siyaseta demokratîk, bi sîstematîka xwe ya ji tevnên konfederal pêkhatî dikare bersivê bide hegemondariyê. Çiqasî şebeke, tor û tevnên hegemonîk (yekdestdariyên bazirganî, fînansî, sinaî, desthilatdarî, dewleta netewe û îdeolojîk) hebin, modernîteya demokratîk jî divê ewqasî tevnên xwe yên konfederal, xweparastin siyaseta demokratîk pêşde bibe.

Di vê mijarê de, xusseke dawî ya divê em li ser rawestin ew e, di navbera herduyan de nakokî û têkiliyê çawa bên meşandin û dewamkirin. Nêzîkatiyên desthilatdarîparêz ên li ser ekolên rizgariya neteweyî û sosyalîzma pêkhatî serdest bûn (li şûna desthilatdariya bûrjûvayê û desthilatdariya proleteryayê, heta dîktatoriya wê; li şûna rêveberiyên

mêtinkar û hevkar û nêzîkatiyên desthilatdarîparêz ên millî) şaşiyên herî trajîk ên dîrokê kirin û ji ber van têgihiştinên wan şensekî dewamkirinê yê kapîtalîzmê hîç heq nekiribû danê. Ev ekolên bi awayekî mirov dikare wan weke hilweşandina desthilatdarî û dewletê, li şûna wan avakirina yên nû binirxîne, ji xeniqandina civakê di nava mîlîtarîzasyonê de, ji destdana civakê ya wesfê xwe yê polîtîk û ji têkçûna civakê di têkoşîna demokratîk de weke hêzên herî berpirsiyar bibîne. Nêzîkatiyên bi vî şêwazî yên dused salên dawî ji dewletdariya netewe ya hegemondariya kapîtalîst re li ser lengeriya zêrîn serketin pêşkêşkirine. Anarşîst,  bi derengî be jî hin tevgerên femînîst ên postmodern, tevgerên ekolojîk, civakên sivîl ên din û têgihiştinên çepgir di vê mijarê de xwedî pozîsyoneke erênî ne. Pêşbîniya anarşîştan ya dewleta netewe ya navendî kirin ku wê çawa ji bo tevahiya çîna karker û tevgerên gelan bi felaket be û derbên mezin li hêviyên wan bide. Ev pêşbîniya wan realîst bû. Di mijara yekîtiya Elmanya û Îtalyayê de jî Marksîst rexne kiribûn û di vê de jî mafdar derketine. Dîsa ji wan xussên girîng e ku divê mirov diyar bike û bîne ziman ku gotine, eger dîrok li gorî dewleta netewe pêşde biçe wê ji bo utopyayên azadî û wekheviyê zirareke mezin be.  Ji ber ku Marksîstan helwesta xwe ji bo dewleta netewe nîşan dan ew bi tundî rexne kirin û bi xiyanetê gunehbar kirin. Ew bi xwe xwedî li konfederalîzmê derketine.

Herdu sîstemên modernîteyê weke me bi awayê berê prensîb û şertên wan pêşkêşkirin di nava demeke dirêj a bi şer û aştiyê de bivê nevê wê bi hev re bijîn. Ev, rastiyeke jiyanê ye. Ev pêvajoya bi dema dirêj ne bi nêzîkatiyên aştiyane yên teslîmkar û bê prensîb, ne jî di her şert û mercî de bi têgihiştin û pratîkên bi şer û pevçûn dewamkirin rast e. Sîstematîka dewleta netewe û sîstematîka konfederalîzma demokratîk bi qasî bi aştiyên bi şert û prensîb tijî ne, di rewşên binpêkirina van şert û prensîban de jî felsefeya siyasetê  û  nêzîkatiyên stratejîk  taktîk şerên xweparastinê li ber çavan digirin  ev ji meşa azadî, wekhevî û demokratîk a civaka dîrokî re di cih de ye.

Zimanê modernîteya demokratîk polîtîk e.

Bi tevahî avabûna sîstematîka xwe bi hunerê polîtîk dihûne û ava dike. Zanistên bingehîn naveroka xwe bi civaka exlaqî  û polîtîk re desthilatdarî ne, polîtîkayê tîne bîra mirov. Rastiya civaka exlaqî  û polîtîk di roja me ya îro de ango pirsgirêka wê ya pêştir ji azadî, wekhevî  demkrasiyê wêdetir hebûnî ye. Ji ber ku hebûna wê di tehlkeyê de ye. Êrîşên modernîteyê yên ji gelek aliyan ve beriya her tiştî li ser wê parastina hebûnê ferz dike. Bersiva modernîteya demokratîk li beramberî van êrîşan di çarçoveya xweparastinê de berxwedan e. Civak neyê parastin polîtîka nayê kirin. Ez dubare destnîşan dikim ku civak tek e, ew jî civaka exlaqî û polîtîk e. Pirsgirêk beriya her tiştî ew e, civaka şaristaniyê têra xwe rizandiye, desthiltadarî û dewletê ew kirine mêtingeh û dagir kirine, di şert mercên hê pêşketî yên modernîteyê de ji nû ve ava kirine. Tevî xweparastinê, siyaseta demokratîk polîtîkvaniya demê bi xwe ye. Siyaseta demokratîk civaka exlaqî û polîtîk pêşde dibe, bi xweparastinê jî ji êrîşên desthilatdariyê yên li ser avahiya hebûn, azadî, wekhevî  demokratîkbûna wê diparêze. Em ne behsa cureyekî şerê nû yê rizgariya neteweyî, ne jî şerê civakî dikin. Em li ser bingehê cudatiyan parastina nasname, azadî, wekhevî û  demokratîkbûnê dikin. Eger êrîş nebin hewcedarî bi parastinê jî namîne.

RASTİYA DÎROKÎ YA ROJHILATA NAVÎN

Nêzîkatiyeke rast nîne mirov bibêje "Di navbera du modernîteyên bi nakok  cuda de timî şer an jî aştî wê hebe." Şoreş  reform çawa ku dikarin tevî pêngavên dijber bi şer pevçûnênan bi pêş bikevin, herweha di nava aştiyê de jî bi awayên lihevkirinê karin pêşketina xwe dewam bikin. Modernîte avahiyên welê ne, di navbera xwe de carnan dikevin pêvajoyên, şer di wan de zêde dibin, carnan jî li hev dikin  li pêvajoyên aştiyê

deriyên xwe vedikin, ango xwedî têkilî nakokiyên tevlîhev in. Alternatîfbûna wan a ji hev re bi siyaset bûyerên rojane yên bi têgînên 'dema kin' ' navîn' têne îfadekirin guhertinên pêvajoyên stewîna sîsteman pêk nayên. Di encama krîzên sîstemîk avahî yên dema dirêj de guhertinên bi kok ên bi vî rengî dikarin pêk bên. Di navbera şaristanî modernîteyan de têkoşîn hewldanên ji bo alternatîfbûnê pênc hezar, pênc sed, du sed sal in, karekî pêvajoyê ye ku bi tevahiya leza xwe hê dewam dike. Çawa ku li her qada dinyayê wê bibe, li qada çandî ya Rojhilata Navîn jî bi şêwazê jiyana alternatîf, bi têgihiştinên çalakî rêxistinî (stratejî) kirinan (taktîk) modernîteya kapîtalîst a di nava krîzê de wê li dawiyê bê hiştin, nirxên modernîteya demokratîk weke serdema sereke wê pêk bên manedar bibin.

Em di pêvajoyeke krîtîk ya dîrokî ku dîrok derfetên pêşketinê yên mezin ji bo mirovahiyê afirandiye û xeteriyên pir cidî di zikhev de dihewîne, di Rojhilata Navîn de rewşa kaos û pevçûneke cidî ya jêre tê gotin Şerê Cîhanî ya Sêyemîn tê jiyankirin heye, Kurdistan jî di navenda van nakokî û pevçûnan de cî digire re derbas dibin. Li roxmî berxwedana qismî ya statûkoya siyasî ya kevin jî, dema hêzên sermaye yên kûrewî li ser esasê berjewendiyên xwe di nava lêgerîna ji vêya rizgarbûnê de ne, gelan jî sîstema xwe ya demokratîk ya dispêre azadiyan bipêşxistinê re hewl dide rewşa kaosê derbas bikin.

Mirovahî li ser esasê şoreşa çandiyê ku di sîstema-eko ya Zagrosan de pêkhatiye heta destpêka sedsala 19. hatiye. di serî sedsala 19. De şoreşa sanayî ku şoreşa duyemîn a mezin e pêk hatiye. Ev şoreşa duyemîn di çêbûna dewlet-neteweê de roleke girîng girtiye. Sîstema dewlet-neteweê jî berbi dawiya sedsala 20. ve li pêşiya pêşketinên civakî, demokrasiye û azadiyan bûye kelemeke pir mezin a cidî.

Ya heqîqeta xwe tinebe, çareserî bextewariya wê jî xeyal e.

Ji bo mirov rûyê rastî yên dewletên netewe yên Rojhilata Navîn fêhm bike, mirov çend mînakên der barê avakirina wan de pêşkêş bike, ev yek dikare me hîn bike. Welatekî bi navê Iraqa îro beriya salên 1920'an tinebû. Weke utopya jî tinebû. Pêdiviyên stratejîk ên Împaratoriya Brîtanyayê berjewendiyên wê yên petrolê li ber çavan hatin girtin dewleta netewe ya Iraqê hat avakirin. Rewşa komikên çandî yên di nava wê de li ber çav nehat girtin. Ji bo di nava xwe de bi awayekî lihevkirî di nav ahengekê de bijîn, prensîpeke dadiyane danenîn. Qralekî ti têkiliya wî bi rastiyên wan ên civakî re tinebû anîn serê wan. Ev qral ji aliyê elîtên eskerî yên xwe zêdetir neteweparêz dihesibandin, ji text hat daxistin. Cumhriyeta hat îlankirin, ji ber ku zêde têkiliya xwe bi cumûhûrê re nebû, tim di nava şert mercên dîktatoryal de ma. Dîktatoriya Saddam Husên a li xwezaya dewleta netewe serwext nebû, dema bi darvekirina wî re ji hev de ket, pîsîtî hem li naverastê belav bûn. Çi teoriyeke sosyolojîk nîne ku Iraqa îro terîf bike. Heye ku weke mekanekî kaotîk hebûna xwe dewam bike.

Ji bîstî zêdetir welatên din ên weke Ereb têne bi navkirin, avakirina wan ji ya Iraqê cuda nîne. Bi rastiyên dîrokî civakî yên wan manedar bikin, têkiliya xwe nînin. Mîna sînorên wan, dîroka wan, surdên wan, alên wan, rejîmên wan civakên ji wan re netewe dibêjin, bi temamî hebûnên xeyalî ne, li gorî berjewendiyên hêzên hegemon hatine diyarkirin. Li vir xussa gelekî girîng ew e, ev hebûnên xeyalî yên darîçav nînin, pîroz têne dîtin bîstçar saetan ji wan re serî tê tewandin, ya rastî ti têkiliya wan bi civak dîrokeke rastî ya jêre rêz bê girtin, nîne. Ya ne heqîqet e, payeyeke mezin a heqîqetê didinê. Bêguman bi tenê weke propaganda. Hemin mirov nikare jê li bendê be ku pirsgirêkekê çareser bike jiyaneke civakê ya bextewar pêk bîne. Ya heqîqeta xwe tinebe, çareserî bextewariya wê jî xeyal e.

Avakirina Îsraîlê hê balkêştir e. Herçiqasî bê îdeakirin ku encama utopyayeke sê hezar salî ye jî ew jî hebûneke lihevçêkirî ya dused salên dawiyê ye. Ji gavên destpêkê yên

avakirinê heta bi gavên dawî yên avakirinê, pêvajo ji destpêkê heta bi dawiyê xwînrij e. Ji bo gel  çanda Cih, diyar e ku gelekî zehmet e, mirov xeyala rêyeke ji vê bi êştir bike. Avakirina Lubûnana li ber serê wê hê seyrtir e. Mirov nikare texmîn bike ka rewşa şer a li vê herêmê wê çawa bê rawestandin. Jixwe zêde nayê fêhmkirin ka navê Sûrî çawa hatiye neqandin. Berî sedsalî li şûna van welatan hemûyan têgîneke Wîlayetên Osmanî hebû. Ev têgîn zêdetir ji rêresmê dihat  belkî jî maneyeke xwe ya diyar hebû. Di dîrokê de mirov ber bi pêşiyê ve biçe, ne navê wîlayetan ne jî navê welatan dimîne. Bi Îslamiyetê re li ser bingehê hisa aliyan, binavkirinek hatiye qebûlkirin. Belkî jî bêtir rast be,  maneyeke xwe ya diyar hebû  ji lewra binavkirina ‘Beled-ul Îslam’ ango bi navê giştî Welatê Îslamê tê qebûlkirin  bi vî awayî ev binavkirin zêde nabe pirsgirêk. Parastina welat, tinebû. Hebûna bi tenê ya perestinê Ellah bû. Ew jî wijdanê hevpar ê civakê bû. Bi sifet  navên xwe, têgîneke xwe ya diyar çêbibû. Belkî jî ya rastir ev be.

Eger em rûyê erdê dema ku hê parzemîn çênebûne bînin bîra xwe, pîrozkirina navên dever  welatan zêde heqîqeteke kûr îfade nake. Ev nayê wê maneyê ku ti maneya xwecihî, herêmî, welatê netewe  erdê ummetê nîne. Maneya wan heye, lê bi qasî ku mirov wan di asta xwedatiyê de pîroz bike, nîne. Li vir a neyênî ew e ku zêde mezinkirin, biqasî ku heqîqeta hebûna erênî jê bibe, serdest dibe. Em heman şîroveyan dikarin ji bo nasnameyên din (al, surd, netewe, dîrok) ên dewletên netewe jî bikin. Bêguman di ragihandin  vegotinê de cihekî girîng ê sembolan heye. Lê weke rastiyên pîroz pêşkêşkirina wan, derfet  îmkan nade agahî  zanîna rast a sosyolojîk. Pêşkêşkirineke bi vî rengî civaka şikil bidiyê, wê bi pirsgirêkên gelekî mezin re rûbir bihêle. Jixwe bi zêdeyî hiştiye. Di vê de bi awayekî bingehîn, mentiqê avakirinê berpirsiyar  pirsgirêk e. Dewletên netewe yên dinya  herêmê, ji ber ku bi temamî li gorî berjewendiyên hegemonîk ên modernîteya kapîtalîst hatine diyarkirin, têkiliya xwe bi heqîqetên xwecihî, herêmî, neteweyî, bajarî  gundî re (ev hem rastiyên mayînde  gerdûnî ne) nîne. Ji lewra bivê nevê, di navbera wan de nakokiyên ciddî  pevçûnên-şer ê pêk bên. Ji ber ku li ser dad, azadî demokrasiyê nehatine avakirin, wê her tim bi naveroka van têgînên gerdûnê re bikevin nakokiyê  pev biçin, şer bikin.

Encama derdikeve holê ew e, wêjeya di dused salên dawiyê de li ser dewleta netewe hatiye kirin, pirr kêm nirxê xwe yê heqîqetê heye. Belkî jî bi qasî mîtolojiyeke serdema destpêkê ya zêde mane nedihat dayînê zêdetir, em bi vegotineke bêmane ya mîtolojiyê re rûbir ne. Li gorî bîrbaweriya min, hubra li ser navê dewleteke netewe bi tenê hatiye rijandin, nirxê wê ji tevahiya dewletên netewe hêjatir  zêdetir e. Ji vê nirxandina min divê neyê fêhmkirin ku ez dewlet  netewe bi tevahî înkar dikim  hebûnên wan bêmane dibînim. Her yek ji wan weke rastiyekê, dewlet  netewe maneyên xwe yên gelekî girîng hene. Rast analîzkirina wan girîng e. Ev hebûnên welê tavilê xira bibin  divê bêne xirakirin nînin. Yên em bi tehlke dibînin ev nînin, mentiqê avakirina dewleta netewe  şêwazê dewamkirina wê ye. Ji ber ku timî şer, qirkirin  xemgîniyê bi bîr dixe; pejinandina heqîqetên civakî  yên qîmeta wan nîne, zêde mezin dike bi bîr dixe.

Kapîtalîzm bi xwe weke sîstem nirxekî xwe yê bi awayekî erênî nîşanî çanda Rojhilata Navîn bide, nîne. Herêmê li yên bi heman rengî, hezarê salan şahidî kiriye. Cotkarî, bazirganî, pere  pîşesaziya kapîtalîzmê li herêmê pêk hatiye  xwediyê dîrokeke herî dirêj e. Di çanda herêmê de nirxandina civaka exlaqî û polîtîk hatiye kirin. Şoreşa pîşesaziyê belkî li vê çandê hinekî zêde bikirana  alîkariya wê bikirana. Lê ji ber ku di derketina wê de weke îndustriyalîzm kirasê îdeolojîk lê hat kirin, bi awayekî hilweşîner tecellî kir. Di çanda Rojhilata Navîn de encama îndustriyalîzmê rê li ber veke ew e, wê hawîrdora jixwe bi zor zehmetî li ser piyan dimîne, bêtir neyênî bike. Jixwe ji roja ku li herêmê pêşketiye  bi cih

bûye, bi rewşên xwe yên çolbûyîn, tinebûn, bêkarî  qirêjiya zêde dibe (di hewa, av bejahiyê de) bi tevahî neyêniyên xwe bi tempoyeke zêde dike vedirişe.

Rojhilata Navîn bi zanist û îdeolojiya pozitîvîst a modernîteya Ewrûpayê çareser nabe.

Kirina sosyolojiya çanda Rojhilata Navîn çiqasî girîng be, encamên derkevin holê jî wê ji bo alîkarîdayîna zanista sosyolojiyê jî ewçend mezin bin.

Rexnekirina dewleta netewe weke avahî  îdeolojî çiqasî girîng be, pêşkêşkirina alternatîfa wê wezîfeyeke ji wê jî girîngtir e. Di herhalî de wexta alternatîfek were danîn, ji prensîpên bingehîn a divê li ber çav bê girtin a yekemîn, yekparebûna çandê ye. Mirov dikare bibîne ku di tevahiya serdemên dîrokê yên ji panzdeh hezar salî zêdetir de çanda civakî di nav hev de bi awayekî yekpare pêk hatiye. Rewşa bi awayekî yekpare pêşketin di tevahiya qadên civakê de bi heman rengî ye. Pêve girêdayî prensîpa duyemîn, modelên çareseriyê divê bi têgihiştinên nasnameyên çandî yên nerm  serê wan vekirî bêne pêşdebirin. Îdeolojiya li dijî dewleta netewe ya asîmîleker  entengrasyonê ya ne li jêr  ne jî li jor xwedî têgihiştina nasnameya yekpareker e, dikare bi têgihiştina nasnameya çanda nerm  serê wê vekirî, jê bibihure. Di çarçoveya rastiya çandî de dewletên netewe heqîqeta xwe nînin, ji lewra modelên karibin ji vê dewleta netewe bibihurin girîngiyeke xwe ya prensîpî hene. Dewleta netewe weke avahî  zêhniyet çiqasî li dawiyê were hiştin, modelên çareseriyê yên li ser bingehê yekparebûna çandî jî wê ewqasî bi bandor bibin. Bandorên yekdestdar  xerîbker ên modernîteyê yên li ser bingehê dijberiya çanda herêmê têne ferzkirin, weke di rastiyê de, divê di heqîqetê de jî bêne destnîşankirin. Hingê prensîpa sêyemîn, li ser hîmê ku sembolîzma li derveyî heqîqetê ya dewleta netewe ji xwe re bike hedef  jê bibihure, weke heqîqet pêşdebirina şêwazê îfadeyê  vegotinê ye. Li dijî yekdestdariya ku modernîteya kapîtalîst li ser sêlingan pêşde dibe, divê di ser sê hêmanên bingehîn ên modernîteya demokratîk re yekparebûn  entegrasyon esas werin girtin. Di tevahiya dîroka şaristaniyê  herî zêde jî dused salên dawî yên modernîteyê de xerîbxistin, parçekirin  jihevbelavkirina li ser çanda herêmê hat ferzkirin, bi tenê bi avahiyên yekpareker  vegotinên heqîqetê dikarin li dawiyê bêne hiştin.

Çanda Rojhilata Navîn bi zanist  îdeolojiya pozitîvîst a modernîteyaEwrûpayê çareser nabe. Dema îdea tê kirin ku çareser bûye, encama derdikeve holê oryantalîzm e. Di dused salên dawî de ya ev paradîgmaya tê pêkanîn derxistiye holê  berbiçav nîşan daye, ne bi rastiyên dîrokî ne jî bi rewşên berbiçav ên rojane yên civaka Rojhilata Navîn re ti têkiliya xwe nîne. Cudahiya di navbera wan de bi qasî newal  geliyekî mezin e. Nêzîkatiyên ji rêresmê yên ji nû ve di bin bandora xurt a oryantalîzmê de pêk tên (di serî de ekolên Îslamî her cure nêzîkatiyên kulturalîst) têgihiştina wan a heqîqetê ji rastiyê gelekî dûr e, ji wêjevaniyeke hişk  zuha wêdetir naçin.

Modernîteya kapîtalîst a bi paradîgmayê re di zikhev de xwe ava dike, rengên digire hem bi dîrokê hem jî bi rewşa berçav a rojane zêdetir bi nakok e. Bi cudahî  nakokiyê heyî re newal  geliyên kûr ên pêk hatine, xwe ji hovîtiyekê wêdetir bi cureyên şer ên kêm hatine dîtin, îfade dikin. Ji vê ne xerîzeyên hundir ên kûr ne jî paşvemayîna çandî berpirsiyar in. Pirsgirêk bi şêwazê pêkanînê yê modernîteya kapîtalîst  bi şêwegirtina wê re têkildar e. Çandek e ku bi hezar salan di zikhev de jiyaye, ji bo bi vî rengî bijî hatiye avakirin (weke çanda maddî  manewî), modernîteya kapîtalîst bi pergelan wê parçe dike radibe, hewl dide acenteyên xwe (kapîtalîzm  îndustriyalîzma dewleta netewe) di nava wê de bi cih bike. Encama vê yekê sedema bi rastî ya hovîtiya diqewime  wê biqewime ye. Jixwe rabihuriya nêz ya qewimî, ji hovîtî  qirkirinê zêde cudatir nebû.

Nîzama Rojhilata Navîn a dîrokî Konfederal e

Dînên yek xwedayî (Mûsewîtî, Xirîstiyantî  Misilmantî) çi di nava xwe de, çi jî di şerê bi dînên kevn  pûtperestiyên wan re, ti carî bi qasî moderníteya kapîtalîst nebin sedema hovîtiyê. Têgihiştina ummetê ya li cem her yekî ji wan, ji bilî cemaetên pûtperestan ên ji mêj ve tesfiyebûyî, her gelî  çanda wî di nava aştî  aramiyê de dikarîbûn bihewînin. Heta di navbera xwe de weke Ehlê Kitêb (Xwediyên Pirtûkên Pîroz) paşvemayî be jî derfet  îmkan didan yekîtiyeke di ser ummetê re. Qirkirin  kokqelandin, têgîn  kirineke naskirî nebû. Îdeayên dijber çiqasî bêne kirin bila bêne kirin, li gorî serdema nû ya pozîtîvîst mirov rabe serdema navîn weke serdemeke tarî bi nav bike, ev yek bi tenê vedîtineke mîtolojîk e. Ev mîta serdema nû ye, xwe weke serdema rohnîbûnê pêşkêş dike.

Dewleta netewe weke ku bi kêrê birrî be, çanda Rojhilata Navîn qelaşt. Ji lewra mirov çiqasî li ser vê dewleta netewe ya li ser çanda Rojhilata Navîn hat ferzkirin raweste, kêm e. Ji ber ku ev kêr bû sedema trawmaya herî nakewe. Em destê xwe biavêjin kîjan trajediyê biavêjin, encam naguhere. Ji hundirê Hindistanê heta bi Sibîryayê, ji çolên Fasê heta bi çolên Erebistanê bicihbûyî yan jî koçer, her cure çandê para xwe ji derba vê kêrê girtiye. Birîn misêwa hê xwîn jê diçe. Şerê Hind-Misilmanan ê her roj li nava Hindistanê diqewime, Keşmîr, herêma ygr a Çînê, geraseya li Afganistan  Pakistanê, li Rûsyayê şerên çavkorî yên Çeçenan  yên din, Îsraîl-Filistîn, Lubûnan  pevçûnênên li welatên Ereban hemûyan, şerên Kurdan bi Tirkan, Ereb  Farsan re, şerê mezhebî yê Îranê, hevgewixandina etnîk a li Balkanan, tesfiyekirina Ermenî, Rûm  Suryaniyên li Anatolyayê  hê gelek mînakên din ên bi hejmartinê naqedin  hê ev şer  pevçûnên bêyî ku guh bidin rêzik  pîvanekê dewam dikin, kî dikare înkar bike ku berhemên hegemonya kapîtalîst nînin?

Eger destwerdanên Neteweyên Yekbûyî NY ya yekîtiya dewletên netewe ye, encamê nadin, Rêxistina Konferansa Îslamî RKÎ ya yekîtiya dewletên netewe yên Îslamî ye, eger bi tesîr nabe,  eger her roj gergeştên bêhejmar ên dîplomatîk ên dewletên netewe yên ji zivêrkirinê wêdetir bi ti rolê ranabin  çareserker nabin, sedema vê dîsa bi zêhniyet avabûna dewleta netewe re têkildar e. Eger ev rastiya sosret  seyr a ji dîndartiyên serdemên destpêk  navîn qat bi qat muhafezekartir  girtîtir hatiye avakirin, timtim weke faşîzmê bi xwe  weke şêweyên bicihanîna wê li her deverê derkeve pêşiya me, divê em hîç matmayî nemînin. Avakirina dewletên netewe bi xwe her tim bi şer pêk hatiye. Dewleteke netewe bi tenê nîne ku bi şer nehatibe avakirin. Ji vê jî xeternaktir, gelo mirov dikare behsa dewleteke netewe bike ku di hundir de bi civakê re, li derve bi dewletên din ên netewe re timî di nava şer, pevçûnên  tengezariyê de nebe?

Nirxandin  analîzên xwe yên der barê çanda Rojhilata Navîn de em hewl bidin bi pêşniyara bernameya siyasî ya demokratîk bigihînin encamê.

Rêxistina ban an jî sîwan a yekparebûna çandî divê weke Konfederasyona Neteweyên Demokratîk a Rojhilata Navîn were avakirin. Mirov avakirina neteweyên demokratîk nasipêre sînorên dewletên netewe yên heyî. Ya ji vê jî girîngtir, sînorên xêzkirî yên neteweyên demokratîk çênabin. Gund, xwecihî, herêmî  bajarên neteweyî lê zêdebûyî dikarin hebin. Lê xwecihî, herêmî  bajarên pirrnetewe  têkel jî dikarin hebin. Ya bêtir asayî jî ev e. Dîrokê timî li bajar  herêmên bêhejmar ên mezheb  dîn, qewm û qebîle di nava hev de mayî, şahidî kiriye. Di dîrokê de bê sedem behsa Babîla navdar a heftê  du milletan, nehatiye kirin. Welatê hevpar ê neteweyan jî dikare hebe. Dîrok bi rastiyên van mînakan tijî ye. Herweha têgihiştina civakên safî  neteweyên safî hîç zanistî nîne. Bêguman çawa ku neteweyên bi zimanekî bipeyivin wê karibin hebin, yên bi pirr zimanan bipeyivin jî dikarin hebin. Mînakên der barê neteweyên xwedî gelek sembolan de jî kêm nînin. Di dîrokê de modela mînaka wê nîne yekdestdariya dewleta netewe  homojeniya wê ye. Me karektera hov  nemirovî ya vê modelê bi sedemên wê re analîz kir. Ji lewra konfederasyona

neteweyên demokratîk a xwe dispêre nasnameya neteweya nerm serê wê vekirî ne bi tenê li gorî rastiyên dîrokî civakî ye, di heman demê de îfadeya wê ya îdeal e. Divê mirov li konfederasyonê ne weke yekîtiyeke dewletan, belê weke yekîneyên kominî yên demokratîk bifikire. Divê mirov li kominên demokratîk weke rêveberiyên yekîneyên civakî neteweyî yên di nava wan de cih digirin bifikire. Pêkhatinên wê di warê bicihanîna prensîpên demokratîk de xwedî cihekî cihêwaz in. Mînaka bêqusûr a rêveberiya demokratîk a civakê ye.

Neteweyên demokratîk ne bi hêza desthilatdarî dewletan, bi kirin û prensîpên demokratîk tên avakirin. Avakirinên xwe disipêrin hêzê, nexasim jî avakirina neteweyan a xwe disipêre hêza desthilatdarî dewletê, çiqasî îdea bê kirin bila bê kirin, li gorî berjewendiyên tevahiya neteweyê nînin; ji bo berjewendiyên egoîst ên zumreyeke olîgarşîk in. Avakirina neteweyan a xwe disipêre demokrasiyê, ji ber ku her kes bi dilê xwe tevlî dibe, bi îdeala dadî azadî pêk tê, bersivê dide berjewendiyên tevahiya neteweyê.

Têgîna neteweya demokratîk rastiya wê, li dijî çavsoriya dewleta netewe, ji bo paşerojê civaka herî manedar a di nava aştî, dad azadiyê de îfade dike.

Konfederasyona demokratîk li yekîneyên konfederal ên hem ji xwe mezintir hem jî li yên ji xwe piçktir vekirî ye. Ew konfederalîzma demokratîk di asta parzemînî de li nava dinyayê teşwîq dike. Bi tenê nabêje dinyayeke din mumkîn e, xwe weke dinya herî rastî, dadî azad îlan dike.

Civaka ku konfederasyona demokratîk ji xwe re dike bingeh, civaka ekonomîk ekolojîk e. Ekonomîkbûna wê tê wê maneyê ku bazarê nas dike, yekdestdariyê red dike. Ji ber ku yekdestdarî bi her cure mêtinkarî zordestiyê ve girêdayî ye, tê redkirin. Bazareke civakî mumkîn e. Bazareke ketibe hakimiyeta yekdestdariyê, ti xêra wê li civakê nabe, bi tenê wê ji mêtinkariyê re xizmetê bike. Ekolojîkbûn tê wê maneyê ku jiyana ekonomîk bi hawîrdorê re di nava têkiliyekê de ye, hewcedariya yekê bi ya din heye. Ekonomiyeke hawîrdorparêz nebe, nikare civakî bibe. Xebateke timî li pey karê komkirinê dibeze, hem dijberê ekonomiyê, hem jî dijberê hawîrdor-ekolojiyê ye.

Pîvana komikên ekonomiyê komin in. Di serî de ne erdên li gorî malbatan hatine dabeşkirin, ne milkiyetên li gorî amûrên hilberînê, ne jî berevajî milkiyeta yekdestdaran a erd û amran, ekonomî ye. Ev amûrên şaristanî modernîteyê ne, gefan li ekonomiyê dixwin. Di her qada xebata ekonomîk de, di berdêla kêrhatin hatina zêde de bi awayekî komin bikaranîna erd û amran di cih de ye, îdeal e. Jina li derveyî ekonomiyê hatiye hiştin bi xwe afirênera rastî ya ekonomiyê ye. Jin ekonomî hêmanên mîna goşt û neynûkê bi hev ve girêdayî ne. Ji ber ku aboriyê li gorî pêdiviyên bingehîn dimeşîne, ne bi pêxîrtengiyê re rûbir dibe, ne hawîrdorê qirêjî gemarî dike, ne jî gefan li avhewayê dixwe. Kengî dawî li hilberîna bi armanca karê bê anîn, rizgarbûna dinyayê jî wê bi rastî dest pê bike. Ev jî rizgariya mirov jiyana wî ye.

Têkiliya konfederasyona demokratîk bi dewletên neteweyî re ne heta dawiyê şer e, ne jî di navê de asîmîlebûn e. Di vê têkiliyê de rewabûna hevdu qebûlkirin heye, têkiliyeke bi prensîp e; du kirdarên di nava aştiyê de hebûna hevdu qebûl dikin hene. Herçiqasî bi şoreşan dewlet bêne rûxandin li şûnê ya nû bê avakirin jî di warê xizmetkirina azadî di dadê de zêde guhertinek çênabe. Li beramberî vê, bûyerên konfederatîf demokratîk weke lingê siyasî yê modernîteya demokratîk di demên kin, navîn dirêj de xwedî wê qabîliyetê ne ku dikarin dad azadiyê pêk bînin.

Bi tevahî redkirin an jî qebûlkirina dewletan ji armancên azadî, wekhevî demokratîk re xizmetê nake. Ji dewletê, nexasim jî ji dewleta netewe bihurîn karekî pêvajoyê ye. Konfederasyonên demokratîk serdestiya xwe qabîliyeta xwe ya çareserkirina pirsgirêkan

çiqasî bidin qebûlkirin, wê dewleta netewe jî bi xwe li dawiyê bimîne. Ev nayê wê maneyê ku di serî de yên dewleta netewe, li hemberî êrîşên modernîteya kapîtalîst wê xwe neparêze. Ji bo bergirî parastina civakê wê her tim hêza konfederasyonên demokratîk hebe.

Konfederasyonên demokratîk qîma xwe bi tenê bi rêxistiniya di nava dewletekê de nayînin. Li derveyî sînoran jî heta bixwazin dikarin xwe bi rêxistin bikin, yekîtiyên xwe yên jor ên konfederal pêk bînin bibin xwediyê dîplomasiya xwe bi xwe.

Li Rojhilata Navîn ji ber neheqiyên dîrokî-civakî gelek şer, pevçûnên tengezarî hê jî dewam dikin, ji bo bidawîkirina vê rewşê, konfederalîzma demokratîk îmkaneke çareseriyê ye. Li dijî astengiya modernîteya kapîtalîst dewleta netewe ku berpirsên rastî yên şer pevçûnênê ne, rêya çareseriyê ya konfederalîzma demokratîk rêya aştî, dadê azadiyê ye. Di vê çarçoveyê de berê pêşî divê şer pevçûnên bêne rawestandin, mirov tengezariyan bide aliyekî neheqiyên dîrokî ji navê bêne rakirin. Ji bo vê jî hewldan xebat gelekî girîng e. Çareseriyên demokratîk ên kirin prensîpên dewleta netewe esas nagirin, divê bi lez bikevin rojevê. Ji bo çareserkirina pirsgirêka Ermeniyan bi tenê vekirina sînoran têrê nake; divê Ermenî karibin bibin xwediyê cihwarên komin ên demokratîk. Ji bo vê jî dikarin rewşê hêsan bikin. Ji bo Asûrî, Elewî, Rûm, Tirk, Kurd, Ereb, ji bo Xirîstiyanên din Cihyan jî divê heman prensîp kirinan esas bigirin. Çiqasî di nêzîkatiyên dewletparêziya netewe de israr bikin, wê li Îsraîl-Filistîn, li Iraqê Kurd-Şîa-Sunnî, Keşmîr, Berberî, Pakistan-Afganistan, Belcîstan, Kurdistan, Lubûnan, Sûdan li gelek qad deverên din, bi vê nevê şer ê dewam bikin. Ji ber vê, bi awayekî lezgîn hewcedarî bi avahiyên konfederatîf demokratîk heye. Çareseriyeke demokratîk a li çi qada şerê germ lê heye pêk bê, dibe ku bandora wê bi awayekî zincîrwarî li tevahiya qadên pirsgirêk li wan hene, belav bibe. Ji ber vê sedemê paşeroja Rojhilata Navîn konfederalîzma demokratîk e.

Hewcedarî heye tevgerên dijberê sîstemê rewşa xwe ji nû ve bigirin dest xwe di ber çavan re derbas bikin. Eger li cihekî pirsgirêk gihiştibin sînorê dawî tevger nikaribin çareser bikin, li wir sîstem ji hev de bikeve jî pirsgirêk ji hev dernakevin, çareser nabin.

Tevgerên pêwendîdarê pirsgirêkên jinê hawîrdorê heta ji modernîteyê nebihurin mumkîn nîne bi awayekî gav gotinên wan hevgirtî, bimeşin. Ji bo gav û gotinên hevgirtî serketinê şert e ku ev tevger xwe bi yekparebûna tevgera civaka demokratîk ve girêbidin.

Tevgerên çepgir ên berhema pêvajoya sosyalîzma pêkhatî ya berê ne berê wan li desthilatdariyê ye, divê êdî berê xwe bidin rêxistiniyên demokratîk ev yek rêya rast a rizgariyê be. Tevgerên em behsa wan dikin, divê tevgerên xwe yên sendîkayî partiyî ji ekonomîzma teng rizgar bikin wan bi yekparebûna tevgerên civakî demokratîk ve girê bidin, ji bo karibin gav biavêjin bi ser kevin ev divê.

Tevgerên din ên ji rêresmê, kulturalîst, xwecihî, herêmî neteweyî divê ji bo çareseriya pirsgirêkên xwe avahiyên, berê wan li sazî, teorî têgînên curbicur ên modernîteyê heqîqetên xwe yên îfadeyê biguherin, bi hêmanên avahî saziyên modernîteya demokratîk re bi yek bin, ev ji bo gavavêtin serketina wan şert e. Enternasyonalîzma nû çiqasî ji modernîteya kapîtalîst, nexasim jî ji dewleta netewe bibihure, wê pêkhatina wê ewqasî mumkîn be.

Ekolên polîtîk îdeolojîk ên dijberê modernîteya kapîtalîst divê xwe bisipêrin xebatên zanista civakî yên ji sosyolojiya pozîtîvîst bihurîbin. Sosyolojiya pozîtîvîst di mezinbûna hegemonîk a kapîtalîst de ji hevparên yekdestdariyê ye. Berhemên hewldanên pêvajoya erênî zanistî yên hêja weke sermayeya hevkartiyê pêşkêşî yekdestdariyên desthilatdariyê sermayeyê kirin ew kirin hevpar. Ji lewra divê mirov yekdestdariya zanistî ya xistine xizmeta sîstemê bişkîne, mîrateya erênî bigire û bi rexnekirina rewşa heyî ya berbiçav

sentez bike û wê weke heqîqetê pêşkêş bike, cewherê xebatên zanista civakî ya nû bi xwe ye.

Her xebata ekonomîk, polîtîk îdeolojîk a dijberê sîstemê, van xebatan esas bigire, wê karbarên xwe bi awayekî serketî dewam bike. Komikên bingehîn ên xebatên zanista civakî, dikarin weke saziyên akademî enstîtu werin avakirin. Ev sazî di çarçoveya pêdiviyan de li her qada têkiliya civakî dikarin bêne damezrandin. Mirov dikare ekola îdeolojîk weke agahiyên di pêvajoya saziyê re derbasbûne xebatên li gorî qadên civakî têne bicihanîn, terîf bike. Di çanda Rojhilata Navîn de xwediyê mîrateyeke dewlemend a tecrûbeyê ye. Di demên pêşî yên belavbûna dînan de avabûna terîqet û mezheban, van xebatan nîşan didin.

Civaka sivîl a roja me ya îro di van xebatan de herçiqasî kêm be jî mirov dikare mînakeke vê yekê bihesibîne. Ya rastî femînîzm tevgereke civaka sivîl a girîng e, di bingehê xwe de ekoleke îdeolojîk e. Ji lewra jî hewce dike ku xwe li ser bingehê zanistî ava bike. Lê ekolên femînîst, di warê analîzkirina civaka cinsiyetparêz a zilamê serwer de ku hêza hiyerarşî, desthilatdarî dewletê ji xwe re dike palpişt û bi giranî hukim li jinê dike, di warê pêşkêşkirina modela çareseriyê de di vê çarçoveyê de hewldanên têne kirin, di jiyana xwe de ji aliyê pêkanînê ve misêwa bi bêhêzî serneketinê re rûbir dibin. Kesayetên awarte nebin, milîtaniya jina azad zehmet e ku xwe bigihîne serketinê. Hin serketinên bêne bidestxistin jî wê bi êrîşên rojane berfireh ên civaka cinsiyetparêz re bêne asîmîlekirin. Ji lewra pêkanîn pratîka kominên ekonomîk, îdeolojîk polîtîk ên di mîhwera azadiya jinê de bivê nevê hewce dikin.

Dema ku mirov çanda Rojhilata Navîn demokratîze bike, divê civaka sivîl mîna klan qebîleyên dema nû binirxîne, heman nêzîkatiyê ji rêûresma dînî re jî nîşan bide, xulase divê mirov zanista civakî bi awayekî jiyana damezrandina klan, qebîle, mezheb, terîqet û dîn bi bîr bixe, pêk bîne, wexta hewce bike bi mîrateya van rêûresman re bike yek, wexta hewce bike xwe mîna wan bi rêxistin bike bimeşîne, ev ji bo serketinê şert e.

Tevger ekolên polîtîk herçiqasî cudahiyên xwe ji tevger û ekolên îdeolojîk hebin jî di navbera wan de têkiliyeke xurt heye, divê hebe. Ekolên polîtîk ên ne îdeolojîk zêde qîmeta xwe nînin ekolên îdeolojîk ên xwe di rastiya polîtîkayê de nîşan nadin jî nikarin xwe bigihînin mertebeyeke hêja. Armanca bingehîn a têkoşîna îdeolojîk pêşdebirina civaka exlaqî polîtîk e. Pêşdebirina civaka exlaqî û polîtîk jî bi tenê bi çalakiya îdeolojîk a xwe disipêre zanista civakî mumkîn e. Ya rastî, çalakiya exlaqî û polîtîk bêyî zanista civakî pêşde naçe. Li dijî yekdestdarên desthilatdarî sermayeyê, em civakê bi tenê dikarin bi zanista civakî ya xwe disipêre çalakiya îdeolojîk û polîtîk biparêzin, pêşde bibin. Heta mîrateya hiyerarşîk, desthilatparêz û dewletparêz ji nava çanda polîtîk a Rojhilata Navîn neyê derxistin û paqijkirin, li dijî rastiyên wan ên rojane çalakiyeke îdeolojîk û polîtîk a bûye şêwazekî jiyana rojane neyê meşandin, demokratîkbûyîn pêk nayê.

Hêzên yekdestdar ên Ewrûpayê ku navenda hegemonîk ên modernîteya kapîtalîst in, li ser bingeha dersên ji şer, pevçûnên tengezariyên pêncsed salî derxistin, piştî salên 1950'î di binyeya xwe de xwe li reformên bi kok rakişandin. Yekîtiya Ewrûpayê YE encama van dersan e. Hedefa wan ji modernîteya kapîtalîst bihurîn nîne, dixwazin bikin ku jiyan pêre bibe karibe dewam bike. Bi bandora van reforman di çanda Rojhilata Navîn de demokratîkbûyîn zehmet e. Modernîte wê bi encamên herî neyênî yên yekdestdariyê, çanda herêmê bikişîne nava rewşa bêhtir nakokî, şer pevçûnênê. Lê belê bi qutbûneke bi kok a ji avabûn têgihiştina modernîteyê û bi modernîteya alternatîf, dikare ji vê rizgar bibe. Modernîteya demokratîk ji vê hewcedariya dîrokî bi kok derdikeve holê. Modernîteya demokratîk bi civaka ekonomîk, civaka ekolojîk û alternatîfa konfederalîzma

demokratîk dijbertiya kapîtalîzm, îndustriyalîzm û dewleta netewe dike, ji lewra modernîteya demokratîk di çanda Rojhilata Navîn de hêmana bingenîn a demokratîkbûyînê ye. Hêzên modernîteya demokratîk, civaka gund-cotkariyê, ezbetên qebîleyan ên koçber, zenaetkar û dijberên koletiyê yên li planê pişt a dîrokê timî li ber şaristaniya serdest rabûn dijberên modernîteyê sentez dike, di encama hewldanên reform şoreşên li ser bingehê civaka ekonomîk, civaka ekolojîk civaka neteweyî ya demokratîk de wê li dijî sê hêmanên modernîteya kapîtalîst bi têkoşîneke dema dirêj, serdestiya xwe ispat bikin.

KOMARA DEMOKRATÎK, HEMWELATİYA AZAD

Em dewletê naxwazin, eger em dewletê bixwazin, emê jî mîna Iraqê bi darê zorê bikin. Ez qala sînoran nakim. Em wekî li Iraqê li pey wezaretan jî nînin. Ya em dixwazin ew e ku di taxan de, gundan de û bajaran de li pêşiya demokratîkbûna gelê me nebûna asteng e. Ev ne tenê ji bo Kurdan, konfederalîzma demokratîk ya Tirkiyê hîn rasteqîntir e. Ez ji bo tevahiya Tirkiyê vêya pêşniyar dikim. Pirsgirêkeke me bi avahiya unîter re nîne. Ez qala dewletê nakim, demokratîkbûyîn û şêwaza damezrandina demokrasiya xwe ya civaka jêr dikim. Wê Kurd vê sîstemê li gorî hemû parçeyan pêk bînin û pêşbixînin.

Ez ji bo herêman jî vêya dibêjim: herêma Soran divê konfederalîzma demokratîk be. Ji bo herêmên Behdînan, Loristan, Bradostî, Botan, Garzan, Amed, Serhat û Dêrsimê konfederalîzma demokratîk kare bibe. Ev ji bo Dersimê îdeal e. Jixwe li gorî çanda Elewîtiyê ye jî. Evna pêngavên demokratîk in. Ji bo rojavayê Firatê jî herêma konfederalîzma demokratîk ya Kurd-Tirkmen dibe; li Mêrsîn, Dîlok û Mereşê jî ev dikare were pêşxistin. Di dîrokê de jî ev heye. Yawiz Selîm vêya qebûl kiriye û pêk jî aniye. Bi dema Sultan Mehmud re dûr ketin ji vêya çêdibe. Nîzama dîrokî ya Rojhilata Navîn Konfederal e.

Di pirtûkan de terîfa min ya konfederalîzma demokratîk nîne. Di pirtûka "Hilweşîna Dewlet-neteweê" de hinek heye. Bookchin û Wallerstein vêya hindekî nîqaş dikin lê, belê hun ya min nikarin di pirtûkan de bibînin.Wexta di aliyekî de dewletparêzî, împeretorî heye koledarî pêş dikeve, lê komeke gel ya dinavberê de maye heye, mîna avahiyên eşîretan, ev jî konfederalîzm e. Hindek sedemên ne anîna ziman ya vê rastiyê heye; şoreşgeriya birjûwa dîsa monarşiya feodal dest dane hevudu û hewl didin vê pêkhateya civakî ji holê rakin. Niha civakên sivîl û komele hene, lê ev gel têr nakin. Şêwaza polîtîk ya Marx û manîfesto, di cewherê xwede xeta polîtîk ne da pêşiya gel. Ji bo Lenîn jî heman tişt derbas dibe. Hatin lîstokên dewletê. Anarşîst, Bookchin, Wallerstein û zanyarên mîna van dewletê nîqaş dikin, lê bi awayeke zelal nikarin deynin holê. Encama ku dixwazin bigihijinê ev e; konfederalîzm şêweyê hebûna demokrasiyê ye. Di têde cih ji herkesê/î re heye. Konfederalîzm organîzasyona jora vana ye.

Dewlet-netewe, bi dewletkirinê tevizanidina gelan e. Neteweperestiyê pêşxistiye. Neteweperestiyeke serdest yan din jî ya bindest e. Di encam de dunyayê xiste nava şerên pir tirsnak (korkunç) yên neteweperestiyê. Bi Hîtler re şerên cîhanî yên tirsnak çêbûn. Qirkirina Ermeniyan tê nîqaşkirin. Di encam de cihê ku neteweperestiya Îttîhat Terakî bigihijiyê qirkirine. Neteweperestî ji rê derketin e.

Vêya spartina heya Sumeran girîng e. Encama ku ez gihiştimê jî desthilatiya di roja me ya îro de, wekheve li dijî civakê şer. Di roja me de ti maneyeke din a desthilatiyê nîne. Ez ê hevokeke din a mîna vêya bêjim: desthilatiya birjûwa yanjî desthilatiya heyî bi dewlet-neteweê re wekhev e; dewlet-netewe jî bi taybet=bi bombeya atomê ya ji nîvê sedsala 20. û virve ji bo gelan û ji bo çandan. Herî dawî me vêya li Iraqê de dît. DYE dawiya dawî de mûdexele kir.

Ji bo berbi neteweperestiya kurd ve çûyîn çênebe, min tedbîrên mezin girt. Ez tevgera Kurd na şemitînim neteweperestiyê ne jî dewletparêziyê. Min vêya di parêznameyên xwe de vekir. Herî dawî jî min bi konfederalîzma demokratîk tedbîra vêya pêşxist. Ezê ked û hewldana gelê xwe vale vale nedim xerçkirin.

Ev sîstema koledar û feodal ya pênc hezar salî pir xeter e. Dîktatorî û neteweperestiya birjûwa pêşdixîne, ava dike. Şerê Tirk, Kurd û Erep pêş dixîne. Dixwazin li ser Kurdan çewsandineke paşverû pêş bixîne. Ez bi boneya ku Talabanî Serokkomar e dixwazim vêya ji jêre bêjim: ez bang dikim ku bi sîstema konfederal re di konsensusekî de werin bahev. Ji ber ku hebûna wan girêdayî min e. Eger ne ji vê berxwedan û hebûna min a vir be ew nikarin li wir rojek jî li ber xwe bidin. Peyama min ji wan re ev e: pêwîst e di çarçoveya Konfederasyona Demokratîk ya Kurdistanê de li hev hatin û aşitî were pêşxistin. Ez wan vedixwînim aşitiyê, diyalogê û li hev hatinê. Mîrateyeke PKK'ê heye, pêwîst e rêzdar bin. Pêwîste di têkiliyên di navbera Tirk, Erep û Eceman de jî diyalog û li hev hatin were esas girtin. Ez bang dikim ku demokrasiyê bi cîh bînin. Di rewşeke berovajî de wê felaket çêbibe. Rêya tenê ya rizgariyê ev e.

Bila Tirkiye min şaş fêhm neke, îtîrazeke min ji dewleta unîter re nîne. Rêzdariya min ji alê re heye. Min hîn li Şamê nêzîkatiya xwe ya ji alê re wekî divê bi rêzdarî nêzîkatî jêre were çêkirin, anîbû ziman. Jixwe bûyera alê jî provakasyone. Ti pêwendiya konfederalızıma demokratîk bi legalbûn yan jî ne legalbûnê ve nîne, cûdabûn naxim nava wê. Ez cûdabûna Kurd-Tirk jî nakim. Ji bo tevahî komên gel derbasdar e. Emerîka û Îngîlîstan jî fêhmkirine dewleta despotîk nameşe, alîkariya xwe vekişandin. Ya nû jî nikarin saz bikin, dinava tengaviyekî de ne. DYE û Îngîlîstan dibêjin 'hindekî ji demokrasiyê re vekirîbin'. Ji bo ji tengaviyê xilas bibin vebûneke demokratîk pir girîng e. Eger em vêya tenê ji DYE'yê re bihêlin wê kaos û krîz be. Hewldana Konfederalîzma Demokratîk ji ber vê yekê girîng e. Rêya tenê ya rizgariyê ev e. Ez sîstema konfederal ji bo Ereban jî, ji bo Tirkan jî pêşniyar dikim. Konfederalîzma demokratîk şêweyeke pêkhatinê û uslubê demokrasiyê ye. Êz dewletê ava nakim. Eger hun bi bizorê jî dewletê bidin min ez qebûl nakim, ezê li dijî derbikevim. Ez demokrasiyê ava dikim, al ya min e, ne ya dewletê ye. Di tirba min de bila sê al li rex hevbin. Ala YE, ala unîter û aleke demokrasiyê sembolîze dike ala konfederalîzmê dibe.

Wê çar reform, Tirkiyê bibe rizgariyê

Ez nabêjim dewletê hilweşînin, konfederalîzma demokratîk ava bikin. Wexta ku te got em dewletê hilweşînin vêya saz bikin tu yê wenda bikî. Lênîn di vir de wenda kir. Di netewe-dewlet de du şêwaz hene, yek şêwazeke çep ya din jî şêwazeke neteweperest e. Yek dibe neteweperestiya çep ya din jî dibe ya rast. Koka wan yeke û ti xêrek ji vana nayê. Wezîfe ne hilweşandina dewletê ye; dewlet eger bixwaze bi komên gel re li hev were dê li hev were. Lê ev, ne dewletbûne. Wê ya herêmî xilas bike. Di herêmî de bi şaredariyan ji bo çareseriya pirsgirêkên xwe dikarin modelek çêbikin. Wê herêm pirsgirêkên xwe bihêza xwe ya cewherî çareser bike. Konfederalîzm di asta jor de nahêle herêm ji aliyê navendê ve were perçiqandin. Dewleta Saddam jî çêbû, me çi fêhm kir ji vê dewletê? Dewleta Tirkiyê heye, em dinava deynan de fetisîn, lê dewlet heye…

Niha ji bo rizgariya Tirkiyê, dixwazim dinava TCD'ê(Tevgera Civaka Demokratîk) de çar reformên mezin di şêwazê vebûnan de deynim pêşiya Tirkiyê.

Reforma Komarê; ez reforma komarê pêşniyar dikim. Ewrûpa vêya dike. Di rastiyê de YE ev e, lê bi şêwazeke cûdatir pêk tîne. Mînak bi Fransayê re krîzekî jiyan dike. Li Fransayê komara dewlet-neteweê heye. Wê ev krîz bi çi were bihurandin? YE dibêje "ji me re vebe", neteweperestiya çep û rast jî dibêje "xwe bikşîne nava xwe". Krîz ji vir

dihilbere. Pewîstiya Komara Tirkiyê û komarê bi reformê heye. Ez ji bo ev were nîqaş kirin didim xuyakirin. Ez li dewsa Meclîsa Millet ya Mezin a Tirkiyê (TBMM) du organan pêşniyar dikim. Di rastiyê de di rabirduya xwe de jî hinek ev têde heye. Ez Senatoyekî Komarê pêşniyar dikim. Li dewsa Desteya Ewlekariyê ya Millî, Konseya Ewlekariyê û Parastinê û avakirina Konseya Destûra Bingehîn pêşniyar dikim. Yek jî wek nîv seroktî û Hikûmeteke Seroktî hilbijartiye dibe. Gel çiye? Ev kongre, Meclîsa Nûneran ya xweserê Tirkiyeyê. Li Tirkiyê 81 bajar hene. Ya rastîn ez ji bo Tirkiyê wiha hizirîm; 7 Eyalet Kurd, 18 jî cihên ku nifûsa Tirk lê zêde ye bi giştî 25 herêm, bêyku nasnameyên din werin red kirin û wê parlamentoyên rêveberiya herêmî ya wan hebe.

Hindek jî dişibe dewleta bajêr ya Atînayê. Cûreyekî sîstema eyaletê ya Elmanyayê ye. 81 bajar bê maneye. Bersiveke wê ya bimane ya çandî û civakî nîne. Di maneya aborî de jî bareke mezin dide çêkirin. Û Kongreyeke Nûneran ya dispêre herêmên navçeyî dibe.

Reforma Netewê; ezê ji bo netewê reformê bêjim. Li dewsa neteweke dispêre dewletê, ez modela neteweke dispêre demokrasiyê pêşniyar dikim. Jixwe di terîfkirina min ya têgîna netewa Tirkiyê de hemû komên etnîkî digre nava xwe. Ne tenê neteweke dispêre Tikran, dîn û nijadan, modela neteweke dispêre mafên mirovan ya rast e. Têgîna neteweke demokratîk ku hemû etnîsîteyan, çandan li hev dicivîne. Ez dewletbûnekî dispêre neteweperestiya Kurdan jî şaş dibînim. Li dewsa neteweke dewletparêz bangawaziya netewa demokratîk dikim. Pêwîste netew xwe terîf bike. Gotina ku dibêje yên li ser esasê hemwelatiyê bi Tirkiyê ve girêdayîne tev Tirkin şaş e. Ev li gel Mistefa Kemal nîne. Hewlnade gel bike Tirk. Wexta ku dibêje "çi şanazim ku ez Tirkim" jî ji bo Tirkmen, Yörük û komên din û hwd. Tirkîtiya xwe îfade bikin gotiye. Vêya ne ji bo Ereban, ne jî ji bo Kurdan ne gotiye. Ez ne li dijî wê me ku yek bi dilê xwe, xwe Tirk bibîne yan jî wer hîs bikeye. Ez reformeke netewê ya dipsêre nasnameyên çandî û vêya nas dike pêşniyar dikim.

Hemwelatiya azad jî wiha ye: ne xulamtî ji Siltanan re, ne jî ji îdeolojiyên dewlet-neteweparêz re. Hemwelatiyeke wiha nabe. Nêzîkatiya ferdiyetparêz ya rojava jî têgihiştineke rast nîne. ferdiyetparêziyeke dijberê civakê jî şaş e. Ne ferdeke li dijî civakê, ne jî civakeke li dijî ferd rast e. Hemwelatiya azad dinavbera herduyan de ye, hevsengeke. Hemwelatiya azad xwe dispêre çandê. Hemwelatiya azad hemwelatiyê/a konfederalîzma demokratîk e. Hemwelatîtî nasnameyên çandî qebûl dike, hemwelatiyeke netewî ya xwe dispêre hebûna xwe ya çandî ye. Li dewsa herkesê bidarê zorê kirina Tirk, kirina Tirkiyeyî yanjî hemwelatê/a netewa Tirkiyê di cî de ye. Ev li Emerîkayê jî wiha ye. Tirkiyetî nasnameyeke li jor e, ez ji netewa Kurdim û hemwelatê/a netewa Tirkiyême.

Reforma Demokratîk; min 25 herêman vekirîbû. Pêwîste yekparebûnekî maneya xwe ya aborî, civakî, çandî hebe. Ev dibe cureyekî Konfederasyonê. Dewlet di jor de heye. Dinavbera gel û dewletê jî tişteke ji nûneran pêktê ku xwe dispêre herêmî heye. pêwîste meclîseke jorîn ya nûneran ku ev nûner dihilbijêrin divê hebe. Ez konfederalîzma Demokratîk ya Tirkiyê wiha terîf dikim. Nasnameya netewa Tirkiyetiyê nasnameya netewa jorîne. Nasnameyeke netewa Tirkiyê ku me hemûyan gire bide ancax wisa were afirandin.

Pirtûka binavê "hilweşîna Dewlet-neteweê", hilweşîna dewlet-neteweê di pîvaneke girîng de vekiriye. Wê Tirkiye sibe-disibe bi awayeke lez were vê nuqtê. Dewleteke çawa? Dewleta Komara Tikriyê, dikare weke Komara Demokratîk ya Tirkiyê jî were guhertin. Mistefa Kemal têgîna "Dewleta Tirk" jî bikar neanî. Hîn wê demê ji yên ku jêre digotin "paşayê min, em bêjin Komara Tirk" re jî got nexêr emê bêjin " Komara Tirkiyê". Em çawa dibêjin Meclîsa Mezin ya Milletê Tirkiyê, dibêjin dewleta Komara Tirkiyê, emê bêjin

netewa Tirkiyê jî. Mistefa Kemal, dibêje wê “Komara Tirkiyê” be. Hîn piştre di salên 1930’an de bi Mehmud Esat Bozkurt û yên wek wî re ev Tirkîtî pêşket.

Bila ev werin nîqaş kirin. Min beriya niha têgîna Komara Demokratîk, hemwelatiya azad anîbû zimên, vêya nîqaş bikin. Ev nîqaş dikarin yek an du sal bidomin. Kûr bibin. Wê ev çar reform Tirkiyê rizgar bike. Rêyeke wê ya din tuneye. Du rê heye: Yan Sewr a duyemîne, wê qirkirinê bixwere bîne, yanjî ev rêyaye. Rêya rast jî ev e.

XİSLETÊN KONFEDERALÎZMA DEMOKRATÎK

Li pêkhatinên siyasî yên pirrtebeqeyî cuda vekirî ye. Pêkhatinên siyasî yên cuda yên ji jêr ber bi jor û bi awayek berfireh, ji ber avahiya tevlîhev a civaka heyî îcbarî ye. Pêkhatinên navendî, xwecihî û herêmî di nava balansekê de li cem hev digire. Ji ber ku her yek ji wan bersivê dide şertên berbiçav, avahiyên siyasî yên pirralîparêz, zêdetir nêzî çareseriyên herî rast ên pirsgirêkên civakê ye. Nasnameyên çandî, etnîk û neteweyî dikarin xwe weke pêkhatinên siyasî îfade bikin û ev heqê wan ê herî xwezayî ye. Ya rastî, pêdiviya civaka exlaqî û polîtîk e. Çi dewleta netewe, çi komar, çi bi şêweyên demokrasiyên bûrûjvayê be, bi awayekî prensîbî bi rêresmên dewletê re dikare li hev bike. Li ser bingehê aştiya bi prensîb dikarin bi hev re bijîn.

Xwe dispêre civaka exlaqî û polîtîk. Muhendisiyên civakî yên kapîtalîst, sosyalîst, feodal, îndustriyalîst û zêdexwer ên bi vî rengî yên bi projeyên şablonîst dixwazin civakan ava bikin weke hewldanên di çarçoveya yekdestdariyên kapîtalîst de dibîne. Civakên bi vî awayî bi xwe nînin, propagandayên wan hene. Civak bi awayekî bingehîn exlaqî û polîtîk in. Yekdestdariyên ekonomîk, siyasî, îdeolojîk û eskerî vê xwezaya civakê dikeritînin bi vî awayî nirxê zêde desteser dikin. Yekdestdariyên behsa wan tê kirin amûrên ji bo xkîrgirtin xkîxwarina ji civakê tevdigerin. Bi serê xwe ti qîmeta wan nîne. Şoreş jî nikare civakê biafirîne. Ji bo çaviyên civakê yên exlaqî û polîtîk ên dejenerekirî û kaduk hatine hiştin ji nû ve bi fonksiyona xwe ya bingehîn rabin weke operasyonan serî li şoreşan tê dayîn, bi tenê di vê çarçoveyê de dikarin bi roleke erênî rabin. Jê pêve îradeya azad a civaka exlaqî û polîtîk diyar dike.

Xwe dispêre siyaseta demokratîk. Li beramberî têgihiştina îdarî û rêveberiya burokratîk, hişk û navendî li ser xeta rast a dewleta netewe, bi tevahî nasnameyên çandî komên civakî ji bo xwe îfade bikin bi pêkhatinên siyasî rêveberiyên civakê bi xwe pêk tînin. Di astên cûrbicûr de bi tayînkirinê ne, bi rêveberên bêne hilbijartin kar û xebatê têne meşandin. Bingeh qabîliyeta biryarê ya bi meclîs, civat û guftûgoyê ye. Rêveberiyên bi serê xwe ferman netêne. Ji desteya koordînasyona navendî ya giştî (meclîs, komîsyon, kongre) heta bi desteyên xwecihî li gorî binyewa her kom û çandê bi qevdên desteyan ên di nava pirravahî û cudatiyan de li yekîtiyê digerin rêveberî kontrola demokratîk a karbarên civakî tê pêkanîn.

Xwe dispêre xweparastinê. Weke yekdestdariya eskerî ne, li gorî pêdiviyên civakê yên ewlekariya derve û hundir di bin kontroleke hişk a organên demokratîk de yekîneyên xweparastinê hêza bingehîn in. Erk û wezîfeya van hêzan ew e, îradeya siyaseta demokratîk a li ser bingehê azadî û cudatiyên civaka exlaqî û polîtîk weke avahiya biryarê ya wekhevîtiyê ye, bi cih bê anîn. Hêzên ji derve û hundir destwerdin vê îradeyê û hewl bidin wê asteng, pûç û tine bikin, bi tesîr dike. Saziya fermanê ya yekîneyan di bin kontrola cot a hem organên siyaseta demokratîk, hem jî endamên yekîtiyê de ye, wexta hewce bê dîtin bi pêşniyarên beramber hev re erêkirinan bi hêsanî dikare were guhertin.

Bi giştî ji hegemondariyê re, bi taybetî jî ji hegemondariya îdeolojîk re cih nîne. Prensîba hegemonîk li cem şaristaniyên klasîk dibe. Di modernîte û şaristaniyên demokratîk de bi xweşîbÎnî li hêzên hegemonîk û îdeolojiyan nayê nêrtin. Cuda wexta ji

sînorên îfade û rêveberiya demokratîk derbas bike, ev yek bi îfadeya azad û rêveberiyên civakê bi xwe tê bêtesîrkirin. Di rêveberiya kolektîf a karbarên civakê de girêdan bi esasên li beramberî hev rêzgirtin, hurmet ji pêşniyarên cuda û biryarên demokratîk re şert e. Di vê mijarê de têgihiştina şaristaniya klasîk a giştî û têgihiştina rêveberiya modernîteya kapîtalîst bi têgihiştina dewleta netewe re bi ser hev de diçin, lê bi têgihiştina şaristaniya demokratîk û rêveberiya wê re xwedî cudahî û cihêwaziyên mezin in. Di bingehê cudahî û cihêwaziyan de şêwazê rêveberiya kêfî û burokratîk, şêwazê rêveberiya exlaqî û demokratîk heye.

Hegemondariya îdeolojîk nabe. Ev di nava îdeolojî fikrên cuda pirraliyan de jî welê ye. Hewce nîne ku rêveberî xwe bi kamflaja îdeolojîk bi hêz bike. Ji lewra çawa ku hewcedarî bi îdeolojiyên milliyetgir, dîndar, zanistperesta pozîtîvîst û cinsiyetparêz nîne, herweha li dijî avakirina hegemondariyê ye. Her bîrbawerî, fikir û dîtin heta avahiya civakê ya exlaqî û polîtîk nerizînin li pey hegemondariyê neçin, xwedî maf in ku xwe bi awayekî serbest îfade bikin.

Li beramberî têgihiştina yekîtiyê ya Neteweyên Yekbûyî ya dewletên netewe ye, di bin kontrola hêza hegemonîk a super de ye, alîgirê Yekîtiya Konfederal a Demokratîk a Dinyayê ya komên neteweyan e. Ji bo dinyayeke hê bêtir ewle, aştiyane, ekolojîk, dadperwer û hilberîner çi ji aliyê hejmarê çi jî ji aliyê wesif ve bi krîterên siyaseta demokratîk li bin banê Konfederasyona Demokratîk a Dinyayê bi awayekî berfireh anîn cem hev a gelek koman şert e.

Weke encam, em hê zêdetir bi awayekî berfireh cudatiyên modernîteya kapîtalîst û demokratîk dikarin bidin ber hev û ev berambertiya wan bi tenê îdeayek nîne, du dinyayên mezin ên berbiçav in. Ev herdu dinya tevahiya dîrokê bi beramberiyeke diyalektîkî carnan bi dijwarî bi hev re şerkirine, lê carnan jî di navbera xwe de ji aştiyê jî kêm nemane. Ev herdu dinya di roja me ya îro de jî bi heman şêweyî di nava têkilî û nakokiyan de carnan şer dikin, carnan jî li hev tên. Bêguman encama vê pêxîrtengiya avabûna sîstemîk a heyî yên gavên rast, qenc û xweşik bi awayekî entelektuel, polîtîk û etîk biavêjin wê diyar bikin.

WÊ KONFEDERALÎZMA DEMOKRATÎK DI SERANSERÊ CÎHANÊ DE BIBE VEBÛNA NÛ YA ÇEP

Wê konfederalîzma demokratîk wê di asta cîhanî de bibe vebûna nû ya çep. Emê di salên du hezaran de bi bihurina Marx û Lenîn vêya bikin. Di salên du hezaran de bingehên îdeolojîk yên konfederalîzma demokratîk heye. Marx di 1848’an de hindek tişt danî holê. Di salên du hezaran de evana hatin bihurandin.

Teoriyên nirxê yên Marx fecaet e. Gumanên min di vê mijara teoriya nirxê de heye. Çepa nû hîn nû nêzîkê vêya dibe. Nivîskarên Pirî (çokluk) yê Wallerstein, Bookchin vana dinivîsînin. Lê di sîstematîk kirinê de em zêdetir li pêşin û pratîkin. Dij derketineke teoriya nirxê li dijî kapîtalîzmê nîne. Dij derketineke wê ya radîkal nîne. Du sedsalê din kapîtalîzmê da jiyan kirin. Anî vê rojê. Di vê teoriya nirxê de di rastiyê de çareseriya civakê, çareseriyeke wê ya dînî û siyasî nîne. Tenê terîfkirina wê ya aborî heye. Ev teorî teoriyeke navend Ewrûpabû. Bi vî awayî gelên ji derveyî Ewrûpayê bêçek hişt. Hemû gelên cîhanê bêçek hişt. Mirov dikare di vê mijarê de gelek cuzên pirtûka binivîsîne, lê ez di vir de kurt derbasdikim. Berovajiyê ku dihate zanîn kapîtalîzmê xurttir kir û anî vê merhaleya har ya îro. Pratîka Rûsiya li holê ye. Demek dirêj kapîtalîzmê li ser lingan girt. Niha jî Çîn kapîtalîzmê li ser lingan digire. Niha Çîn bi aboriya xwe Emerîkayê li ser lingan digire. Di vê rewşê de gelên cîhanê wenda dikin.

Ya rastîn ez vê misyona me binavê mirovahiyê wek derçûnekî gerdûnî dibînim. Dibêjil ku Sıtematîkek û uslubeke min ya xweserê min heye. Di rastiyê de çepa ku tê xwastin di dunyayê de were pêşxistin ev e. Çep tenê dikare li ser vê esasê pêşbikeve. Eze bang bikim ku hêzen dost divê zêdetir biprensîp (tutarlı) nêzîk bibin û têbigihîjin. Li Tirkiyê çep tenê dikare li ser vê esasê pêşbikeve. Herkes dikare biçe encameke biwate û têgihîştî. Pirsgirêka Kurd jî dibe berbi çareseriyê biçe.

Demokrasî teng tê fêhmkirin

Dema wisa dibêjin, hawirdor û ekolojî di plana paş de dibîne û nakeve rojevê. Hêzen jêr bi vî awayî dibin de di perçiqin. Her wiha ne pirsgirêkên jinê ne jî pirsgirêkên ekolojiyê dikare çareser bibe. Wê çendkesên yê fînans kapîtal û dewlet-netewe jixwere bibe. Di vir de tê dîtin ku nakokiyeke pir mezin heye. Hilweşîna sosyalîzma pêkhatî jî vêya derxist holê. Min vêya danî holê. Dibêjin nêrîna min hatiye guhertin. Di nêrînên min de ne guhertin lê pêşketin heye. Min karî biawayeke pir sîstematîk deynim holê. Ne pir kûre, lê di vir de şanseke min ya ez bi awayeke berfireh lêbikolim nîne. Tenê min karî ez rûyen wî yên îdeolojîk deynim û senteza wê ya polîtîk çêbikim. Min vana bi xetên stûr danî holê.

Girînge ku ez di vê mijarê de werim fêhm kirin. Eger bawerî bi azadiyê heye, xwasteka rizgarbûnê ji kapîtalîzma kûrewî heye, pêwîst e di çarçoveya van prensîban de hatina bahev çêbibe. Bi kûrewîbûna kapîtalîzmê re mirov ketin nava bêkariyeke pir mezin. Ji bo bihurandina vêya pêwîste girîngî bi van tezan werin dayîn. Eger xwasteka xilasî ji pirsgirêkên mezin yên kapîtalîzmê hebe, derçûn (çıkış) di vir de ye. Bi avakirina dewlet-neteweên nû re û xemilandinê re ev nabe. Ne gengaze ku bi vî awayî xilasî çêbibe. DYE rûpoşa (maske) demokrasiyê bikartîne. Çep tişteke nû pêşnaxîne. Yên me jî qêt demokrasiyê fêhm nakim. Hîn jî demokrasî teng tê fêhmkirin.

Di sala 1848'an de Karl Marx digot, dewleta ne dewlet. Di Manîfestoya Komunîst de vêya îlan dike, lê xebera xwe ji demokrasiyê nîne. Marx nikare bersiva vêya bide, sîstemeke polîtîk ya rast nikare deyne pêşiya gel. Hun dizanin, Hegel dewletê weke "meşa Xwedê ya ser rûyê erdê" terîf dike. Marx dixwaze ya Hegel hinekî sererast dike. Di Komuna Parîsê ya di sala 1871'and e digihije gelek heqîqetan; lê di dawiya dawî de dibêje dîktatoriya proleterya, ango wê ya na bihurîne. Di Enternasyonala yekemîn û duyemîn de hewl dide vêya bibihurîne, lê nekarîn bibihurînin. Tê dema Lenîn. Lenîn, xeletiya dîktatoriya proleterya ferq dike, dibêje divê demokrasî hebe, ya rastîn di ferqa demokrasiyê de ye; lê sosyalîzma wî jî di encamde veguherî dewletê û dîktatoriya Sovyetê û sosyalîzm wenda dike.

Tevgera 68'an tevgereke mezin bû, ji bo azadiyê gaveke baş bû, lê dawiya wê ne anîn. Hîn piştre Femînîzm pêngavek avêt, lê ji bûyîna rêxistineke civaka sivîl xilas nebûn û wêdetir neçûn. Hinek Sosyolog xwastin dersan ji anarşîzmê derxin, lê nikarin îdeolojiya birjuwaziyê, xeta klasîk derbas bikin. Bookchin dibêje "me di afirên îdeolojiya birjuwa de bi xwedîbûn". Dibistana Frankfurt, dibistana Annales vêya nîqaşkirin. Pirtûka Împeretoriyê cûreyeke rexen lixwegirtine, lê serî tevlîhev dike, gelek xeletiyên xwe hene, naçe armanceke rast.

"Ji Rengîniyan re erê, ji cûdaxwaziyan re na!"

Îdeolojiya neteweperest sê sed sal Ewrûpayê, ev sedsal jî Rojhilata Navîn mehf kir. Cihûyan neteweperestiya Siyonîst; Ereban, Neteweperestiya Baas; Tirkan jî, neteweperestiya Îttîhat Terakî têkbir. Ecewît jî demek digot Federasyona Tirkiyê, Azerbeycan û Qibris. Konfederalîzm modeleke bidil a çareseriyê ye ku serî li şîdetê naxe û cî nade cûdaxwaziyê ye. Şêwaz û perspektîfê min yê çareseriyê ev e. Nêzîkatiya dijberê vê jî neteweperestiye. Şerên neteweperestiyê gelan di qedîne. Eger em li Tirkiyê

konfederalîzmê bisernexin, wê neteweperestiya birjuwa ya federe ku şêwazê Barzanî û Talabaniyê pêşbikeve. Di Tirkand e jî neteweperestî bihêz e. DYE jî alîgirê neteweperestiya Kurd e. Ti wateyekî hev qir kirinê nîne. Ez her timî li dijî qetilkirinê sekinîm. Li vir jî ez ji bo vêya jiyan dikim. Bi serwextbûna Kurdan ya demokrasiyê re wê ev kar çareser bibin. Ew şîara "ji cudahiyan re erê, ji cûdakariyan re na" ya li Amedê avêtine, şîareke xweş e. Şîareke girîng û rast bû.

Sûrî dewleteke ecayîp neteweperest e. Îran jî neteweperestê Şîaye. Tfaqa DYE, Tirkiye û Îsraîlê jî xeter e. Lê konfederalîzma Kurdan dikare van pirsgirêkên Rojhilata Navîn çareser bike. Dewleta unîter wê bimîne, lê wê biçûk bibe. Jixwe neçariye jî. Dewletên mezin ye wisa dihilweşîne. Ez behsa dewleta obez dikim. Jixwe ÎMF biçûk dike, YE demokratîk dike. Dewletek bi deyneke pênc sed milyar dolaran nikare xwe ser lingan bigire. Ji bo Kurdan ne dewlet, konfederalîzma demokratîk. Ev wê bi şêweya yekîtiya jinan, yekîtiya şaredariyan, yekîtiya taxan, yekîtiya karkerên demokratîk, yekîtiya ciwanan, yekîtiya xwendekaran gel bigire nava xwe. Demokrastîk e, gel dinavê de heye. Ez van têgînan nû dikim. Bila şaş neyê fêhm kirin. mînak, Tirk-iş û Disk jî her yek ji wan konfederasyoneke. Di wê maneyê de ez behsa tişteke derveyî hiqûqî nakim. Ne dewleteke ji derveyî dewletê. Em maneyeke nû li vê têgînê bar dikin.

Têgîn, teorî û herwiha saziyê ba**ş** nîqa**ş** bikin

Ev vêya ji bo Tirk, Kurd û Ereban jî pêşniyar dikim. Bîst û du dewletên Ereban heye. Ev bîst û dewletana dikarin di navbera xwede konfederalîzma demokratîk saz bikin. Lê dewleta Ereban, ya Tirkan heye, navend dewlet dihizirin, hatina wan ya vê nêzîkatiyê hindek zehmet e. Di şûnde tenê Kurd dimînin ku vêya pêk bînin. Ji bo Kurdan konfederalîzma demokratîk dibe. Federeya Barzanî, Talabanî heye. Ewna çêbûnên armanca xwe dewletin. Ya min pêşniyar kiriye dewletê hedef nakin. Ji ber vê yekê min gotibû têgîn, teorî û herwiha saziyê baş nîqaş bikin. Netewa demokratîk ne weke netewa dewletparêz e. Konfederalîzma demokratîk wekheve bi netewa demokratîk re, netewa demokratîk jî wekheve bi demokrasiya gel re. Di ya min pêşniyar kir de tewere (eksen) ya dewletê nîne, rêxistiniyeke nerm e. Ev di heman demê de feraseta me ya wekhevî, azadı û sosyalîzmê jî tîne ziman. Çawa ku Ewrûpa berbi konfederasyonê ve diçe, di dema me ya pêş de jî konfederalîzma Rojhilata Navîn dibe. Jixwe dîroka Rojhilata Navîn meyîldarê konfederalîzmê ye. Ez hema ji bo wê îro sibe were damezrandin vêya nabêjim, lê rêveçûna dîrokê di vî alî de ye.

Nirxandina min ya dawî ya konfederasyona demokratîk girîng e, ne tenê ji bo Kurdan, ji bo tevahî cîhanê jî derbasdar e. Konfederalîzm meyla ku niha Ewrûpa ketiye nave. Li Ewrûpa çar sed sal netew û mezheb ketin qirika hevdû. Di sala 1649'an de Westfalya, dîsa serdema 1851 heye, li piştî wê Şerên Cîhanî ya yekem û duyem hatin jiyankirin, bi sed hezaran mirin. Şerê dîn'an û mezheban çêbûn. Neteweperestî rê li pêşiya vêya vekir, lê niha ev dibihurin. Ez pir zelal datînim holê. Li Tirkiyê yên ketine nava neteweperestiya etnîkî û dînî pir in. Îro li Ewrûpa pêşengiya konfederalîzma demokratîk birjuwazî dike. Ez têgîna konfederalîzma demokratîk ya gel bikar tînim. Ne dewlete, naspêre netewê, sînorên siyasî esas nagire, ji kîjan çanda siyasîbe, jî kîjan dînî be bila bibe hemû digire nava xwe. Beriya niha min şeş prensîp dabûn diyarkirin. Naveroka siyasî ev e. Min têgîna "demokrasiya jêr (taban)" bikar anîbû. Li gorî vê têgînê wê ji meclîsên hemwelatiya azad berbi jor ve pêşbikeve. Wê di jor de navendeke sist a koordinasyonê hebe.

Du rêbazên netewbûna Kurd

Di roja me de netewbûna Kurd du rêbazan bi hev re û di nava hev de di ceribîne. Ya yekemîn, rêya tebeqeya serwer a Kurd neteweperestên paşverû Feodal-birjuwa ku

sîstema kapîtalîst ya rojava pişgirî dike û niha bernameya wê jî wek Dewleta Kurd a Federe şênber kiriye ye; ya duyemîn jî rêya gelê Kurdên kedkar ya hêzacewherî esas digire, neteweke demokratîk û azadîxwaz hedef dikeye.

Di ya yekemîn de ku paşverûbûyî, berjewendiyan û benden feodal, dînperest û eşîretger bikartîne, ya duyemîn eşîretgeriyeke teng derbaskiriye, naspêre meylên feodal, dînperest, bendên demokratîk, azadîxwaz, wekhevîparêz esas digire.

Ya yekemîn bi giranî di rewşeke dagiriyê de DYE, li Kurdistana Iraqê hewl dide pêşengiyê bike, ya duyemîn jî dispêre hêza cewherî û di demokratîkkirina Tirkiyê de Kurdistanê ne weke kelem, lê weke destek dest digire û hewl dide bike pêşeng e. Wê girîngiya ev herdû rê anjî rêbazan di dema me ya pêş de di nava Rojhilata Navîn de di aliyê çareseriya pirsgirêkên demokratîk netewî yên giranbûyî de baştir were fêhm kirin. Yan wê Kurdistan bibe Filîstîn-Îsraîleke nû ya berfireh, anjî wê bibe welatê çareseriya aşitiyane ya demokratîk, kîjan rêbaz giraniya xwe deyne, ewê biser bikeve. Eger çiqasî ji rêbazên etnîkiyeke teng, qewmiyetparêz, dînperest û neteweperest dur sekinîn çêbibe û girîngî bi rêbazên eskerî neyên dayîn, wê çareseriya demokratîk, azad û wekhevîparêz ya pirsgirêkên civakî yên pir û tevlîhev ya Kurdistanê jî ewqase bi rêya netewbûna demokratîk re çareser bibe.

Rêya duyemîn ya çareseriya demokratîk, Kurd bi xwe demokrasiya xwe ava bikeye. Eger rêya yekem bi xitime, bi awayeke xwezayî rêyeke bikeve dewrê; bi îradeya xwe ya esasî pêşxistina rêzik û saziyên xwe yên demokratîk in. Hilbijartinên parlementeran û şaredariyan careke din da nîşandan ku li roxmî ku Kurd bi xwe namzetên xwe dihilbijêrin jî derkete holê ku dewlet bi qanûnên xwe yên dijdemokratîk, bi kelemên madî û bi amûrên darê zorê re rêzdariya xwe ji encamên hilbijartinê re nîne û nahêle ku xwe bipratîk bibe. Eger di dema me ya pêş de ev sînordarkirin zêde bibin, wê ceribandinên demokratîk yên cewherî yê Kurdan lezgîn bibin.

Demokrasî +Dewlet

Eger bi temamî were gotin demokrasiyeke bê dewlet, di vê pêvajoya dîrokî ya heyî de xwe xapandine û xeyalperestiye. Pêwîstî bi heyîna dewleteke sînorên xwe diyarbûyî û bi biçûkkirinê re li ser li hevhatinek çêbûyî, heye. Jixwe di maneyeke klasîk de em bi israr destnîşan dikin ku di vê ji vê otoriteyê re neyê gotin dewlet, weke saziyeke giştî ya civakî ya hemdemtir, di cewher de û şikil de girêdayî demokrasiyê ye were gotin. Di aliyê din de li Kurdîstanê demokrasî, tê maneya ku gel hem di maneya herêmî de hem jî di maneya giştî de delegeyên xwe yên di ber dabînkirina pêwîstiyên wek ekonomîk, civakî, siyasî û pêwîstiyên hevpar yên civakî de wezîfardarkirine hilbijêrin û çavdêriyê ser wan bikine. Demokrasî eleqeya xwe ji dewletê nayêne. Karên esasî yên gel in. Dewlet encax dikare rêz bide îradeya wê ya demokratîk. Eger xizmetek pêwîst bike, bi cîh tîne. Kurt û kurmancî wê di dema me ya pêş de li Kurdistanê formîla “demokrasî+weke otorîteya gelemperiyê ya giştî dewleta Tirkiye, Îran, Iraq û Sûrî” ku baş hatiye terîfkirin û li ser vêya jî li hevkirinek çêbûye weke xaleke bingehîn ya bernameyê dibe ku li pêş were dîtin. Wexta ku em dibêjin xaleke bernameyê, em nabêjin yek xal tenê. Eger were xwastin dikare wek sê-pênc xalan jî were cûda kirin.

PÊWÎSTE FERQA D**İ**NAVBERA G**İ**RÊDANA GEL YA PLATONÎK DE Û BEND Û FERQA **Dİ**NAVBERA HUNERA POLÎTÎKAYA DEMOKRATÎK DE BA**Ş** WERE DÎT**İ**N

Demokratîzekirina Kurdistanê ji pirsgirêkeke qanûnî wêdetir projeyeke berfireh a civakî ye. Li dijî beşên destnîşankirina gel a çarens û nasnameyê înkarê dikin, wê di warê aborî, civakî û siyasî de destekê bidin beşên civakê yên li derveyî wan ji bo karibin bibin xwedî îrade, bibin xwedî sazî, rêveberî û kontrolê. Ev pêvajoyek e timî dimeşe. Hilbijartin

tenê yek ji wan amran e serî lê tê dayîn ji bo ev îrade were hilbijartin. Ya esas, rêxistinbyîna fonksiyonel a gel û çalakiyên wî divê. Ev pêvajoyeke ji komînên herêmî yên gund û bajaran, meclîsên bajaran û belediyan heta kongreya gel a giştî pêvajoyeke demokratîk e. Jiyaneke siyasî ya dînamîk îfade dike. Li gorî şert mercan dikare bi gelên cîran re bi awayekî hevpar bi demokrasiyê xwe bi rêxistin bike, eger ji bo vê derfet neyê dayîn dikare sîstema xwe ya demokratîk pêk bîne.

Demokratîzekirina siyasetê, di qada siyasî de wezîfeyeke girîng e. Siyaseta demokratîk partiyên demokratîk dixwaze. Heta partiyên siyasî û saziyên bi ser wan ve navend-dewlet bibin û daxwazên wan civakî nebin, mirov nikare behsa demokratîzekirina jiyana siyasî bike. Li Tirkiyê partiyên siyasî wek milekî propagandaya dewletê û dema li ser dewletê jî rûdinên ji amûrê kurtêl belavkirinê wêdetir ti maneyê îfade nakin. Di derbasbûna partiyên navend pirsgirêkên civakî de li gorî wê pêkanîna statuyê parçeyekî girîng ji reformên siyasî ye. Li ser navê Kurdistanê damezrandina partiyan hînê jî qedexe ye. Ji bilî partiya dewletê şens zêde ji ti partiyan re nayê naskirin. Eşkere ye, divê ev statu were guhertin. Li ser navê Kurdistanê damezrandina partî û koalîsyonan bi cewherê demokratîkbyînê re têkildar e. Divê tenê serî li amûrê şîdet û cihêtîxwaziyê nedin.

Li Kurdistanê têgihîştina li civak û siyaseta demokratîk û hewldanên ji bo veguherînê xwedî maneyeke girîng in. Nemaze karektera despotîk a rastiya polîtîk, têgihîştin û bi cih anîna pîvanên demokratîk dike mijareke bi qasî av û hewayê girîng. Ne tenê polîtîkayên navend rastgir, piraniya polîtîkayên çepgir jî karektera wan navend-dewlet, despotîk û kurtêlxur in. Ev taybetiyên bingehîn pir baş eşkere dikin ka çima gelên Rojhilata Navîn ji siyasetê nefret dikin. Piştî ku rola li dewletê hatiye barkirin bibe xapandin û tepisandin, êdî neçar civak li derveyî siyasetê dimîne, ya rastîn dibe objeyek siyaseta polîtîkayên tehekumkar. Rêbaza herî baş ji bo li dawî hîştina vê xerîbketina li hemberî polîtîkayê, bi hunerê siyaseta çarçove û armanca wê civaka demokratîk, dibe. Heta polîtîka demokratîk ji aliyê teorîk û pratîk ve esas neyê dîtin, hem hewldanên ji bo komên civakî wê nikaribin xwe ji xapandinê xilas bikin. Di vir de zêde maneya niyeta baş nîne. Divê mirov cudahî têkiliya di navbera dilsoziya platonîk a gel û hunerê polîtîka demokratîk de baş bibîne.

Rêya herî baş ya rê li ber trajediyên nû veneke ewe ku, bêyku bi rêbazên tunekirinê li ser pirsgirêka Kurd de çûyîn çêbibe, înkar bike, tune û pespaye bike, bi aşitiyeke ji dil û biprensîp û reformeke demokratîk, biwêrekî nêzîkê çareseriyê bûyîne. Formîla vê ya giştî jî ku me li gorî rastiya Tirkiyê destgirtiye, weke hevbeşiya qada ewlekarî û gelemperiyê û giştî kirina formîla ‘dewlet+di Kurdistanê de demokrasî’ gelemperîkirina vêya di nava Rojhilata Navîn de ye. Di pêkanînê de xwedî formîlasyoneke wiha ye; ‘ Di Rojhilata Navîn de demokratîkbûn+ dewleteke li hember demokrasiyê bihişyar=ji Kurdistanê re azadî’ ye. Kurdistana azad tê maneya Kurdistana demokratîk. Di gelemperiya cîhanê de civînên Porto Allegra û veguherandina platformên jor netewî yên demokrasiyên herêmî û veguhertina Kongreya Kûrewî ya Demokrasiyê ya gelan a ne navend dewlet. Wek encam Kurdistana Demokratîk>Federasyona Rojhilata Navîn a Demokratîk>Kongreya Demokrasiya Kûrewî dikare bibe şîara surnational a dema li pêşiya me.

Dibêjim ‘Tevgera Civaka Demokratîk’

Ji ber vê sedemê ez dibêjim Tevgera Civaka Demokratîk. Çarçoveya vê ya bingehîn ev e. Pewîst e hun bi awayeke herî xuluqkar xwe birêxistinkirinê re danhevkerbin (toparlayıcı), ji bo aşitiyê jî bibin quweteke pir bihêz. Aşitî û biratî, dewlemendî û azadiyê tîne. Em ji vêya re pêşengiyê dikin.

Dive Ji konferansên herêmî berbi kongreyan ve çûyîn çêbibe. Divê tevlîbûna demokratîk esas were girtin. Pêwîst e di şêwazeke demokratîk de be û bi xwe spartina

civakê re pêşbikeve. Ev xebateke girîng e. Kurd, Tirk û hindikayî dikarin dinavê de cî bigirin. Lê rêxistiniyeke bi şêwazê seksiyon jî dibe. Li Egeyê, li Behrareş seksiyonên cûda dibe. Tevgera Civaka Demokratîk wê navend civak û bi armanca demokrasiyê were pêşxistin.

Yên ku bawerî û dilsoziya xwe bi Tevgera Civaka Demokratîk re hebin dikarin tevlî bibin. Ev ne koalîsyoneke. Yên ku ji xwe bawerin wê tevlî bibin û di têde cihê xwe bigirin. Ew her şeş prensîbên ku min pêşniyar kiriye di aliyekî de ji bo wan jî derbas dibe. Di demokrasî de neteweperestiyeke neteweperest a netew nîne. ekonomî jî dibin çavdêriya civakê de ye.

Tevgera Civaka Demokratîk xebateke legal e. Ne partiyeke ajotî (güdümlü) ye. Ev tiştên qanûnîne, divê bihişyar nêzîkatî ji vana re were çêkirin. Di nava xwe de serbixwebûna xwe heye.

Ezê li dijî partiyeke li ser hîmê neteweperestiyê pêşbikeve jî bisekinim. Ji reforma dewletê re erê, ji dijîtiya dewletê re na. Di feraseta min de partiyeke rantxur û propagandakarê dewletê nîne. Armanc civak e. Demokratîkkirina dewletê ye. Armanc daxwazên demokratîk yên civakê li ser dewletê ferzkirin e.

Wê vêya çawa bike? Wê vêya bi meclîsên hemwelatiyên azad bike. Ez ji bo vêya jî çar yeke dibêjim: wê meclîsên gund, bajarok, tax û bajaran werin çêkirin. Wê desteyên koordînasyonên jêr werin saz kirin. Ez ji vêya re dibêjim demokrasiya jêr, rêxistiniya jêr (taban). Cewherê qanûnên demokratîk ev e. Wê gel vêya deyne holê û bi navbeynkariya nûnerên xwere bigihîne dewletê. Vêya derbasê rêzik û bernameyan kirin, wezîfeya yên bi vî karî eleqeder dibinine ye. Ev garantiyeke esas e. Ne partiyeke rengê dînî di têde giraniya xwe bide nîşandan, ne jî partiyeke rengê neteweyeke tenê bide pêş; ez dibêjim partîbûneke alîgirê civakeke demokratîk. Ji her hemû netewan mirov dikarin di têde cihê xwe bigirin. Ev ruhê çareseriyê ye.

Netewebûna demokratîk û netewe, bêyî xweseriyên bajar, xwecih û herêman nikarin hêza rêvebertiyê bi dest bixin.

Hêmanê herî girîng ê modernîteya klasîk avahiyên dewleta netewe yên navendgiriya hişk ji jor ve ji aliyê sermayeya global, ji binî ve ji aliyê tevgerên çandî ve tê tengavkirin û bi vî awayî ji hev de dikeve û lewma hewl didin li şna wan zêdetir rêveberiyên xweser ên bajar, xwecihî û herêmî bi cih bikin. Ev meyla ku roja me ya îro her diçe bi hêz dibe, divê bi tevgerên neteweya demokratîk di zikhev de pêş bikeve. Neteweya demokratîk weke şêweyê rêveberiyê zêdetir nêzî konfederalîzmê ye. Konfederalîzm bi awayekî şêweyê rêveberiya siyasî ya neteweyên demokratîk e. Bajarê bi hêz bi tenê dikare bi rêveberiyên xweser ên xwecihî û herêmî hebûna xwe bi dest bixe. Baregehên yekdestdariyên sermaye û desthilatdariyê nebin jî pêkhatina bajaran mumkîn e. Tevahiya dîroka şaristaniyê bajar neçar hatiye hiştin bibe baregeha mêtinkarî û zordestiyê, lê rizgariya rastî ya bajêr bi civakbûna bajarê polîtîk û rêveberiya demokratîk mumkîn e. Di dîrokê de rêveberiyên konfederalîst demokratîk ên bajaran gelekî dewlemend bûn, ev dikarin bêne pêşdebirin belkî bi vî awayî bajar ji avahiya xwe ya bye xirbeyê kansêrolojîk bê rizgarkirin.

Ji aliyê şêweyên rêveberiyan ve herdu tevger divê wekhev bin bigihîjin hev. Netewebûna demokratîk netewe, bêyî xweseriyên bajar, xwecih herêman nikarin hêza rêvebertiyê bi dest bixin. Yan wê bikeve kaosê ji hev belav bibe yan jî wê bi modeleke nû ya dewletdariya netewe li dawiyê were hiştin. Ji bo neketina herdu rewşan, divê tevgera neteweyê demokratîk ji sedî sed li bajar, xwecihî û herêmî bi xweseriyên demokratîk were pêşdebirin. Li beramberî vê ji bo rêveberiyên xweser ên bajar, xwecihî û herêmî bi derbekê neyên daqurtandin û karibin hêzên xwe yên ekonomîk, civakî û siyasî tam bi kar

bînin hewcedariya xwe hene weke neteweya demokratîk bi tevgera neteweyî ya demokratîk re bi yek bin. Dewletdariya netewe ji bo herdu tevgeran jî timî ya li ber derî digire û ferz dike yekdestdariyên hêza navendgiriya hişk in, ew jî bi hevgirtineke têkz dikarin jê bibihurin. Naxwe herdu tevger û heta weke diyarde, çawa ku di demên rabihurî de gelek caran hatiye dîtin bi tehlkeya homojenkirinê wê nikaribin ji helandin û tesfiyeyê xelas bibin. Şert û mercên dîrokî çawa ku di sedsala 19. de para bêtir li gorî dewletdariyên netewe bûn, di şert û mercên roja me ya îro de jî ango li gorî rastiyên sedsala 21. jî li gorî neteweyên demokratîk di her astê de li cem rêveberiyên xweser ên bajar, xwecihî herêmî ye.

Sîstema Komala tê maneya ku gel xwe li her derê û di her mijarekî de birêxistin kirinê

Min beriya niha jî sîstema Komala terîfkiribû. Sîstema Komala nayê maneya avakirina dewletekî. Ne dewletên klasîk yên federal yan jî dewletên klasîk yên konfederal e. Şêweyeke rêxistinî ya demokratîke ku dewlet nebe jî gel dikare xwe bi birêxistinkirinê re birêve bibeye. Ango sîstema Komala tê maneya ku gel xwe li her derê û di her mijarekî de birêxistin kirinê. Di vê mijarê de pêşniyara min ewe ku bihezaran rêxistin û komele bêne avakirin. Mînak komeleya xweşîkkirina gund, komeleya bidaristankirina gund, komeleya dara berûyê. Hesenkeyf di bin bendavê de dimîne. Eger wê bendav were çêkirin, li dijî ew bendavên ku tên hizirîn werin çêkirin jî teqez divê li dijî van plansaziya komeleya bendavên biçûk, komeleya parêzvaniya hawirdor û bihezaran rêxistinên civaka sivîl û komeleyên bi navên cûda cûda dikarin bêne sazkirin.

Pêwîste pêşbirkek demokratîk hebe. Di vir de miliyet, neteweperestî nîne; hemwelatiyên azad hene. Komar avahiyeke siyasiye. Di vê maneyê de nîqaşek dayîna meşandin, partîbûnek avakirin dikare buhrana civakê û siyasete ji holê rake.

Li Rojhilata Navîn Ermenî, Asûrî û hindek komên din yên gelan ku esle xwe Kafkasîne hene. Rolê van gelan jî dişibin yên Kurdan. Hemû şert û merc ji van gelan re jî weke rêya tenê ya xilasiyê ye. Bihêmû hêza xwe ya heyî di rêya demokratîkbûnê de xebatkirinê ferz dike. Di welatên ku di tê de jiyan dikin de û di gelemperiya Rojhilata Navînde demokratîkbûn çiqasî pêşbikeve, wê derfetên pêşxistina hebûna xwe ya çandî û derfetên azadiyê ewqase zêde bibe. Ev gelên ku wek hêjmar kêmin lê, her yek xwedî çandeke cûdaye, qîmeta xwe pire, rengin û dewlemendiyên demokratîkbûnêne.

Ez nabêjim bila herkes tevlî van fikrên min bibin, yên dixwazin tevlî bibin wê tevlî bibin. Dibe ku fikrên cûda jî hebin. Wê dost jî di têde cihê xwe bigirin, wê sempatîzan jî di têde hebin lê, wê koma min jî cihê xwe di tê de hebin. Di vir de tişteke der qanûnî nîne. Ez di girtîgehêdeme lê, mafê xwe yê hemwelatiya demokratîk bikar tînim. Ez dikarim bibim sempatîzanê vê partiyê. Qanûniye. Fikrên cûda jî dibin, lê divê bihevre tevgerkirin çêbibe. Serdemeke dîrokiye. Modela Hevseroktiyeke min pêşniyar kiribû hebû, ez vêya dubare dikim. Ez hevseroktiyê di ecibînim. Ez vêya ji bo biratiya Kurd-Tirk jî girîng dibînim. Pêşniyara min, bila yek ji wan Tirk be. Ev wê yekîtiya Kurd-Tirk sembolîze bike.

Zêdahiya Kurdan ku tiyê felsefeya 'jiyana azad' e, wê her timî li benda pêşengên xwe yên ji vê tîbûnên wan re bibin bersiv, bimîne. Piraniya Kurdan hatiya wê asteyê ku bi awayeke lez dikare ew qalibên jiyana dema navîn ya wê tune dike terk bike. Her wiha wê xwe li qalibên dewlet-neteweoka ku lingeke bihêz ya modernîteya kapîtalîst pêk tîne û şensê jiyaneke azad ji ti gelîre nasna nake, ku jêre hatiye pêşkêşkirin, negire ango qebûl neke. Şêweyê rêveberiya demokratîk ya konfederal ku dikare herî zêde şensê pêkhatina daxwazên wan yên wekhevî û azadiyê bide, hem di aliyê dîrokî û coxrafî de, hem jî ji aliyê taybetmendiyên xwe yên esasî ve ji bo Kurdan şêweyeke herî baş û di cî de ya polîtîk e. Di vê maneyê de KCK (Koma Civakên Kurdistan), wê hem bi avahiyên dewlet-netewe re ku

di her aliyekî de wê ya dorpêç kiriye pirsgirêkên xwe çareser bike, wê hem jî ji bo bi avahiyeke madî ya dewlet-neteweokeke nû re pirsgirêkan nejî, wek çareseriyeke herî dest dide rol digire û maneyek îfade dike. KCK, wek modeleke pêşeng ya Konfederalîzma Demokratîk ya Rojhilata Navîn a forma bingehîne ku, bi hemû civakên Ereb,Îranî,Tirk, Kurd, Ermenî, Rum, Cihû û gelên bi eslê xwe Kafkasîne ku di şerên dewlet-netewea ku çavkaniya xwe ji modernîteya kapîtalîst digire de tên îmha kirin û li ser mozaîka gelên Rojhilata Navîn tê ferzkirin, tên qir kirin, ji ber çewsandin û xirap bikar anînan, hemû xeyalên wan yên jiyaneke azad hatine tunekirin re û her wiha bi tevahî etnîsîteyan, mezheban û dînan re, bi komên ku bi eslê xwe Ewrûpayîne û mafên xwe yên mirovane jiyan nakin, careke din vegerandina pîrozbûna wan, îfadeya jiyana wan ya azad û gihandina destkeftiyên wan yên madî modeleke pêşenge. Eger ji kaosa Iraqê Komareke Federal bizê, di pêşketineke wiha de dikare rol bigire.

Spartek, Hedef û Wezîfeyên Konfederalîzma Demokratîk ya Kurdistanê

Konfederalîzma Demokratîk ya Kurdistan ne sîstemeke dewletiye, sîstema demokratîk ya gel ya ne dewletiye. Sîstemeke ku di herêmî de di meclîsên xwe yên hemwelatiya azad de û di serî de jin û ciwan, hemû qismên gel dikarin di têde rêxistiniya xwe ya demokratîk avabikin, li ser bingeha hemwelatiya konfederasyonê bi awayeke rasterast, azad û wekhev tevlî polîtîkayê bibine. Ango dispêre prensîba hêza cewherî û têra xwe kirinê. Hêza xwe ji gel digire û ekonomî jî di nav de di her qadekî de têra xwekirinê esas digire.

Konfederalîzma Demokratîk ya Kurdistanê hêza xwe ji kûrahiya dîroka civakî û ji daneheva çanda dewlemend ya Mezopotamyayê ya ji dîrokê tê digire. Dispêre pêkhateya civaka xwezayî ya demokratîk û komînî ku ji sîstema klanan û konfederasyonên eşîretan heya roja me ya îro di dirêjahiya dîrokê de nexwastine bikevin nava navenda civaka dewletparêz.

Di dîroka nêz de jî xwe dispêre rastiya gel ya welatparêz, jiyaneke azad û ezmûneke demokratîk ya rêxistinê ku di encama tekoşîna PKK'ê ya ev sî salî zêdetire de di serî de di zîndanan de, çiyan de û di hemû qadan de dide meşandin û bi sedan şehîd di ber de hatine dayîne.

Konfederalîzma Demokratîk, dixwaze dewlet ji binîve di reformê re derbas bibin û rêzdar bin li hember demokrasiyê, li pêşiya demokratîkbûnê nebin kelem û hemû kelemên heyî jî ji holê rake û li ser vê esasê jî têdikoşe. Wê ji vêya şûndetir sê hiqûq li Kurdistanê bimeşe. Hiqûqa YE, hiqûqa Dewleta Unîter, hiqûqa Konfederalîzma Demokratîk. Biqasî ku dewletên Unîter yên wek Îran, Tirkiye û Sûrî hiqûqa konfederal ya gelê Kurd nas bike, wê gelê Kurd jî ya wan nas bike û li ser vê bingehê bikare li hev hatinê esas bigire.

Konfederalîzma Demokratîk, Modela Civaka Ekolojîk esas digire. Di gelek aliyan de li dijî zext û çewsandinên cinsiyetparêziya civakî sekinînê û vêya jî bi rêya tekoşîna azadiya jinê ji holê rakirinê esas digire. Demokrasiyêke dispêre ekolojiyê û azadiya cinsiyetê di her qadeke ku gelê Kurd lê hene de û birêxistinkirin û li ser vê esasê li dijî hemû paşverûtiyan tekoşînkirinê li pêş dibîne. Maf û azadiyên takekesî bi pêşketina demokrasiya civakî re dike yek.

Konfederalîzma Demokratîk hemû hebûnên çandî nas dike, parastina wê ya dike û azadiya ramanê esas digire. Li ser vê esasê bi awayeke demokratîk çareserkirina pirsgirêka Kurd, di her asteyekî de naskirina nasnameya Kurd, pêşxistina ziman û çanda Kurd weke wezîfeyek dibîne.

Konfederalîzma Demokratîk ji bo çareseriya civakî, bêyku serî li şîdet û dijwariyê bide çareserkirinê esas digire, ango siyaseteke aşitîxwaz esas digire. Li dijî êrişên li ser welat, gel û azadiyan û binpêkirina hiqûqê mafê parastina rewa bikar tîne. Konfederalîzma

Demokratîk, tevgera organîzekirina avakirina demokrasî û sîstema civakî ya gelê Kurd bixwe ye. Di hundir de netewa demokratîk, di ji dervede jî sazîbûnekî jor netewî îfade dike. Organîzasyona yekîtiya rêxistinên civakiye ku di qadên komînî yên wek siyasî, civakî, aborî, çandî, bawerî, mezhebî, etnîkî û ekolojîk de, xwe dispêre azadiya cinsiyetê û rêvebirina xwe bixwe ya civaka rêxistî bûyî ye. Li ser vê esasê di serî de bang li jin û ciwanan, li hemû qismên civakî dikim ku rêxistiniyên xwe yên demokratîk çêbikin, çalakiyên xwe yên demokratîk bilind bikin û xwe bi xwe birêve birinê esas bigirin, dikim.

Ji ber ku Konfederalîzma Demokratîk dispêre zihniyeteke kûr a demokratîk û têgihiştineke azad bêyku ti ferq û cîhewazî bixe navbera gelan de yekîtiya wekhev-azad ya hemû gelan esas digire. Li ser vê esasê alîgirê yekîtiya hemû gelên Rojhilata Navîn û hêzên demokrasiyê ye. Têkiliya xwe bi dewletên cîran re, li ser esasê prensîba yekîtiyeke wekhev û azad ji bo mafên siyasî, civakî û çandî bi cîh werin, sererastkirinê li pêş dibîne. Li ser vê esasê careke din ez bang li gelên herêmê dikim ku werin yekîtiya konfederal a demokratîk, dewletên cîran jî bên helwesteke demokratîk.

Konfederalîzma Demokratîk, li dijî emperyalîzma kûrewî alîgirê demokrasiya kûrewî ya gelan e. Sîstemeke ku di sedsala 21. de hemû gel û mirovahî neçarin ku vêya pêkbînine. Ev jî di asta kûrewî de berbi konfederasyona demokratîk ve û berbi serdemeke nûve çûyîne. Li ser vê esasê ez bang li hemû mirovahiya demokratîk dikim ku di bin banê kongreya Demokrasiya Kûrewî de bên dunyayeke nû ava bikin.